**Ronahî** — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1209 | 2-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Muzîka Kurdî li benda xwedîderketinê ye

Lêkolîner Zeynep Yaş diyarkir ku pêwîstiya xezîneya muzîka Kurdî bi berhevkar, arşîvkar, lêkolîner û akademîsyenên pisporê mijarê heye.

Muzîka Kurdî di nava şert û mercên heyî yên cîhanê de hewl dide hebûna xwe dewam bike. Li gel polîtîkayên asîmîlasyonê yên bi salan û hewldanên tinekirinê jî bandora muzîka Kurdî îro jî li deverên cuda yên cîhanê heye. Lêkolînên dewleta Tirk ên li ser muzîka Kurdî digihêje heta salên 1990'î. Darulelhan (Dibistana muzîkê ya destpêkê ya Osmaniyan) tenê di lêkolînên sala 1916'an de 850 stranên Kurdî qeyd kir.

**Qeyda herî kevn a kurdî**

Li gorî lêkolînên li ser muzîka Kurdî qeyda herî kevn digihêje heta sala 1902'an. Di qeydên ku ji aliyê lêkolîner Zeynep Yaş ve hatine dîtin, ji Yûsûf Bey stranên 'Qasim Begê' û 'Li minê', ji Nazli Xanimê stranên 'Xelîlo Lawo' û 'Lo Dilo' û ji Alî yê ji Diyarbekirê strana 'Diyarbekira Şewitî' hene. Ev qeyd çend sal beriya qeyda hunermendê Suryanî Kosrof Malool e ku li Emerîkayê li ser plaqê xwendibû.

**Tevlî mîrateya muzîka kurdî hate kirin**

Zeynep Yaş ji ANF'ê re axivî û bi bîr xist ku qeydkirina deng di salên 1890'î de destpê kir, lê belê Kurdan qeyda muzîka xwe piştî salên 1950'î pêk anî û got, "Heta wê demê produksiyonên Kurdan tine bûn. Antropolog, arkeolog û etnolog ên Ewropî ku di salên 1902, 1905 û 1908'an de li Kurdistanê lêkolîna qadê kirin, qeydên fonograf dîtin, piştre jî li Emerîkayê yekemcar muzîsyenên Suryanî û Ermen li ser plaqên 78'an muzîka Kurdî qeyd kirin. Piştî 122'an me karîbûn xwe bigihînin van qeydan. Bi tesadufî haya me jê çêbû û me tevlî mîrateya muzîka Kurdî kir. Yên ku me heta niha karîbû xwe bigihînin dibe ku beşeke gelekî biçûk a arşîvên berhevkirî ye. Berhemên muzîka Kurdî ji ber ku bi navê welatên serwer weke arşîva muzîkê ya Fars, Ereb û Tirk hatine qeydkirin, xwegihandina wê zehmet e. Piştî sala 1926'an ji Rûsya Sowyetê heta bi Emerîka, Iraq, Îran, Misir, Lubnan û Qûweytê gelek dewletan ji ber sedemên siyasî di radyoyên xwe de cih dan muzîka Kurdî."



**Kurdan çanda devkî baş parastin**

Yaş destnîşan kir ku di parastina nasnameya neteweyî ya Kurdan de kevneşopiya devkî gelekî girîng e, aliyê herî xurt ê Kurdan kevneşopiya dîrok û çanda devkî ye û got, "Di nava nifşan de bi gotinê, bi rîtmê baş hate parastin. Ji ber ku ya kevneşop hate parastin, li gel ewqas destwerdanan jî xwe parastiye û bûye hêmanên bingehîn ên nasnameya neteweyî ya xwezayî ya gelekî. Muzîka Kurdî jî di salên destpêkê yên qeydkirinê de mîna hemû muzîkên cîhanê li destwerdana teknîkî rast hat. Ji ber ku dema qeydkirinê ji 2-3 heta 5 deqeyan hate bisînorkirin, di forûma muzîka destan, efsane û dengbêjiyê ya Kurdan de jî hin guhertin çêbûn. Zembîlfiroş destaneke ku bi rojan dikare bê gotin, lê ji ber vê yekê dengbêjan bi forma herî guncaw jinûve berhev kirin û bi rengê çend deqeyan amade kirin. Tişta balkêş jî ew e ku bandora destana ji du, sê deqeyan bi qasî bandora vegotina 7 roj û 7 şevan e."

Yaş anî ziman ku di nava Kurdan de bi taybetî li Bakur çanda dengbêjiyê demekê gelekî xurt û zindî bû, lê belê demekê wateya xwe kêm bû û got, "Di salên 1990'î de bi zêdebûna televîzyon û radyoyên bi Kurdî weşan dikirin, zêdebûna nifûsa Kurdan a li dîasporayê, girîngiya nasnameya siyasî û mafên çandî kir ku têkiliya çanda kevneşop bi çanda devkî û muzîkê re hîn xurt bibe û ji nû ve bû xwedî girîngî û wateyê."

**Dive girîngî ji berhevkirinê re bê dayin**

Yaş anî ziman ku eger mîrateya çandî ya xwecihî û xwezayî neyê berhevkirin û qeydkirin piştî 20 salan wê mirov nikaribe qala çanda devkî ya kevneşop û çavkaniyên muzîka Kurdî bikin û got, "Bi pêşketina teknolojiyê re wê xezîneya çandî roj bi roj winda bibe, piştî 20 salan wê dibe ku tiştek nemîne ku em berhev bikin. Lewma niha pêwîstiya me bi berhevkar, arşîvkar, lêkolîner û akademîsyenên ku di vê mijarê de pispor in, heye." **ANF**

# Global Witness: Di sala 2023'yan de nêzîkî 200 aktîvîstên jîngehê hatine kuştin

Global Witness raporek weşand û diyar kir ku di sala 2023'yan de li seranserê cîhanê nêzî 200 hawirparêz hatine kuştin. Hat ragihandin ku Kolombiya ji bo aktîvîstan, welatê herî bitalûke ye.




Di raporê de hate destnîşankirin ku nêzîkî ji sedî 85'ê 196 cînayetên li dijî aktîvîstên jîngehê li Emerîkaya Başûr pêk hatine û 79'ê wan cinayetan li Kolombiyayê pêk hatine. Ku ev hejmar weke bilindtirîn hejmara ji sala 2012'yan heya niha hate îfadekirin.

Global Witnessê di rapora xwe de cih da îfadeyên hawirparêzên jin Jonila Castro û Jhed Tamanoyê jî ku her du aktîvîst li dijî projeya vesazkirina Kendava Manila ya li Filîpînê derketibûn. Her du hawirparêz di raporê de dibêjin ku ji dema serbest hatine berdan heya niha, gef li wan tên xwarin. Her du aktîvîstên jin tevî ku artêşê sûcdar dikin ku ew revandine jî rayedar jî dibêjin ku her du aktîvîs endamên serhildaneke komunîst in ku piştre dev jê berdane.

Global Witness di rapora xwe de ji bilî yasayên Îngilîstan û Emerîkayê yên cezayên giran li aktîvîstan dibire, ''asta çavdêriya bêrehm'' ya li welatên Ewropayê jî şermezar dike.

**Bi kamîreya Ronahî**



## FERHENGA BIWÊJAN

**Pîsê tosin e:**
- Ew bixwe pir gemar e lê her dem behsa paqijiyê dike.

**Serî çîç e binî zîrç e:**
- Ew bixwe li hemberî derve xwe xweşik û paqij dide xuyakirin, lê mala wî gemar e.

**Şîretên melê ne:**
- Bixwe nake lêbelê ji xelkê re dibêje; bikin.

Şîretên wî yên Mûsa ne, kirinen wî yen Firawn in.
- Gotinên baş dibêje, lê tiştên xirab dike.

Te çi xwar ku çi jî pê vereşî?
- Di mijarê de nakokiyek heye; çawa ku xuya dike mijar ne wisa ye.

**Tenûra avzêm nan napêje:**
- Ji bo tiştên binakok tê gotin.

**LI SER GIRÎNGÎ, HESRET Û BÎRÎKIRINÊ**

**Agir pê ketiye:**
- Pir bîriyê kiriye; bi hesreta wî dişewite.

**Agir ji çavê wî diçe:**
- Bi haman wateyê.

**Bayê tu anî bagerê tu anî:**
-Me pir bîriya te kiribû; ev demek e tu bi ser me ve nehatî.

**Bi çar çavan li bendê ye:**
- Pir dixwaze; pir girîng dibîne; pir bîriyê kiriye.

**Cihê wî xuya dike:**
- Em bîriya wî dikin.

**Çavê min li riya wî ye:**
- Min bîriyê kiriye.

**Çavên min li riya wî qerimîn:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên me li te digerin:**
- Em bîriya te dikin; em pir dixwazin te bibînin.

**Çi gur miriye:**
- Çawa çêbû tu hatî serdana me; çawa em hatin bîra te ?
(Dema yek dereng diçe serdana dostekî xwe hingê tê gotin?

**Em çavên xwe li te digerînin:**
- Em bîriya te dikin; em pir dixwazin te bibînin.

**Ew şevên xweş li me çûn gilî:**
- Ew xweşî û şahî êdî venagerin.

**Gurek li çolê miriye:**
- Çawa çêbû tu hatî serdana me; çawa em hatin bîra te?
(Dema yek dereng diçe serdana dostekî xwe hingê tê gotin)

**Gurek li kû miriye:**
- Bi heman wateyê.

Kîjan bayî tu avêtî vir?
-Me pir bîriya te kiribû; ev demek e tu bi ser me ve nehatî.

**Te piyê xwe hene kiriye:**
- Me pir bîriya te kiribû.

**Vê carê jî me dît:**
- Me pir bîriyê kiribû; ji zû ve me nedîtibû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Kobanê ne ket, serket... (1)



Di Tîrmeha 2014'an de, bi zêdebûna êrişên çeteyên DAÎŞ'ê li ser Kobanê seferberî hat ragehandin. Piştî ragehandina seferberiyê hevserokatiya Rêveber a KCK'ê jî, di 7'ê Pûşbera 2014'an de ji tevahiya gelên Kurdistanê xwest ku piştgiriyê bidin seferberiyê. Piştî banga Rêber Apo bi taybet Bakurê Kurdistanê ket nav hewldanên mezin.**R-3**

# 'Dîlgirtina Rêber Apo dîlgirtina mirovahiyê ye'

**Jina bi navê Terfa Hecî Elî ku ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha xwe ji jiyana derveyî malê qut kiriye û eger ne ji bo rewşeke lezgîn be ji mal dernakeve diyar kir ku dîlgirtina Rêber Apo dîlgirtina aşitî û demokrasiyê ye.R-5**



**Ronahî** — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1209 | 2-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# Projeya piştgriya civakî ji bo nexweşên Telasîmiya




Ji bo peydakirina pêdiviyên bijîşkî bi taybet ji bo nexweşên penceşêrê û zarokên telasîmiyayê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Heyva Sor a Kurd rêbazeke piştgiriya civakî ji bo nexweşxaneya Onkolojî, Telasîmiyayê û şewatê ya li bajarê Qamişlo pêş xist.**R-6**

# JINEOLOJÎ ŞOREŞA ZANISTA JINÊ YE

Zanista Jin Jineolojî zanista şoreşa jinê ye ku xwe dispêre bingeheke zanistî, cara yekem di 2008'an de bi Sosyolojiya Azadiyê ya Rêber Abdullah Ocalan re wekî têgîneke ket rojevê. Jineolojî weke zanista civakê ku li ser bingehê modernîteya demokratîk pêş dikeve, rolek girîng di avakirina civaka exlaqî-polîtîk û demokratîk de digre ser milê xwe.**R-2**




# Hazirtiyên Festîvala Mono Drama



Komîna Şano ya kantona Cizîrê ragihand ku ew ê bi navê ( Mono Drama) festîvalekî li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dar bixe. Armanca wê jî xurtkirina rola lîstikvan û derhênerên şanoyê.**R-7**

# ENKS'ê sîxura MÎTa Tirk û PDK'ê ye

Polîtîkayên xiyanetê yên qirêj ku li dijî ciwanên Rojavayê Kurdistanê tên meşandin, li Enqere û Hewlêrê tên amadekirin. ENKS'ê bi fermana Mîta Tirk û PDK'ê ciwanên kurd yên Rojava direvînin Başûrê Kurdistanê, bi rêya pereyan, fihuşe û madeyên hişbir hewil didin wan bikin sîxur û di çerxa xiyanetê de wan dizîvirînin.**R-4**




Her têgeheke em bikartînin ne heqîqet e — Nehîr pale — R-2


Piştperdeya şer û pevçûnên rojhilata navîn — Dilyar Cizîrî — R-4

Dîsa Lavrov û dîsa gef û sucdarkirina Kurdan — Zekî Bedran — R-5


Kuştina Hasan Nasrallah — Farûk Sakik — R-5


Bajar bê çand nabe — Rohat Bulut — R-6


Berhevkirina Gotinên Pêşiyan Karê Bêkaran..!! — Kemal Necim — R-7

# Jineolojî mizgîniya avakirina civakeke demokratîk e

Endama Navenda Jineolojî Nofa Elî û Jina enternasyonal ya famînîst Mariya Karlos diyar kirin ku tevahiya ol, zanist û felsefeyan jin bê maf û hêz dîtin, lê Rêber Apo ji bo jinê şoreşek li dar xist û wiha dibêje; Jin jiyane û yê jiyanê jî diafirîne jine.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Zanista jin jineolojî zanista şoreşa jinê ye. Ev şoreş xwe dispêre bingeheke zanistî. Jineolojî weke zanista civakê ku li ser bingehê moderniteya demokratîk pêş dikeve, rolek girîng di înşakirina civaka exlaqî-polîtîk û demokratîk digire ser milê xwe. Herwiha rizgarkirina hafîzeya civakî ji desthilatdarîyê û pêşxistina hişmendî, çandek demokratîk û wekhev de xwedî rolekî girîng e. Jineolojî li çiyayên Kurdistanê xwe pênase kir, li her çar aliyên Kurdistanê xwe civakî kir. li Rojhilata Navîn û Ewropa xwe gihand jinên ji welatên cuda. Lê hebûna jineolojî, li Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hişt ku raste rast di pêkanîna erkên şoreşê de xwe şînber bike.



civakê jî berê xwe daye hilweşîna avahiya exlaqî û polîtîkya civakê. Rêber Apo vê rewşê wekî rewşekî ji pirsgirêkên civakî ango girantir wekî qirkirina civakê pênase dike. Lewra ji bo pêşîgirtina vê qirkirinê pêwîstî bi şoreşê heye. Ji ber ku pêwîstiya şoreşê ji pêwîstiya guhetrtin, nepejirandin û redkirina şert û mercên heyî derdikeve.

### Jin nakokiyên felsefeya demokratîk û kapîtalîst dijîn

Rojane jin dijwariya nakokiya zayendê ango aloziya kûr di navbera felsefeya jiyana azad a moderniteya demokratîk û felsefeya talan û kuştin ya moderniteya kapîtalîst de dijîn. Pisgirêk û têkoşîna azadiya jinan hem xwedî taybetmendiyên gerdûnî û herêmî ye, hem jî xwedî taybetmendiyên dîrokî û jiyanî ye, çawa em dizanin ku qirkirinek li dijî jinan li waletekî gef li hebûn û rûmeta hemû jinan dixwe, destkeftiyên têkoşîna azadiyê yên li herêmekê tên bi derxistin jî dibin rênîşandaneke ji bo têkoşîna azadiya jinên li watên din ên cîhanê. Li hemberî pergala qirkirinê ya ku di asta cîhanî de jiyana jinan, xweza û civakan dixe metirsiyê, em hewcedarî çareseriyekê gerdûnî ne.

### Pêwîstiya sedsala 21'an bi şoreşê hebû

Sedsala 21'an bi meşên girseyî yên jinên cîhanê ji bo azadî, aştî û demokrasiyê dest pê kir. Di aliyek de jin helwesta xwe diyarkirin ku vê sedsalê bikin sedsala azadiya jinan. Qirkirina jinê di tu demên dîrokê de bi qasî sedema heyî berbiçavtir û kûrtir nebûye. Girêdana nakokiyên vê serdemê bi pirsgirêka azadiya jinê re rasterast tê hîskirin û dîtin. Ji bilî vê ev rewş wekî kirîza malbat û têkiliya jin û mêr a ku bîrdoziya serdestiya mêr şekil daye xûya dike û gihiştiya asta rêjeyî şerekî. Jinên ku her roj tên kuştin, dawî ji jiyana xwe tînin, zewaca bi zorê û temen biçûk, tundî û bi dehan pirsgirêkên din... Qirkirina jin û

### Şoreş bi pêşengiya jinê pêş dikeve


Rewşa jin û malbatê li Kurdistanê di salên 80'ê ve hat dîtin ku li gor rastiya bingehên dîrokî û çanda berxwedana jinên li vê erdnigariyê pêwîstî bi şoreşek zanistî, fikirî û civakî heye. Û ev şoreş divê bi pêşengiya jinan pêş bikeve. Şoreşa jinê ne tenê li dijî hêzên kapîtalîst, netewe û çînên serdest e, heman demê guhertina mêrtîya serdest û koletiya jinan dike hedef. Rêber Abdullah Ocalan di parazนameya xwe ya Rojhilata Navîn de bi kurtasî armancên şoreşa jinan wiha dibêje:

- Li dijî îdeolojiya cinsperest şerekî dewamî û dijber.
- Li dijî zihniyeta destavêtin û tecawizkar a 24 seatan rojên li ser kar e, di warê exlaqî û polîtîk de xurkitina şer.
- Diyardeya zarokanînê ya bi armanca mêtinkarî û desthilatdariyê mehkûmkirina redkirin.
- Di îdeolojiya xanedantî û malbatê de şoreş.
- Hêza jiyanê bi jinê re weke tayê herî xurt ê dostaniyê, hevaltiyê û civakbûnê di afrandina bedewî, sedqat, aştî û esaletê de ji bo parvekirina bi awayekî azad û wekhev dîtin.
- Bihurandina felsefeya heyî ya jiyana bi jinê re. Avakirina tekiliyên nû yên li ser esasê felsefî û zanistî di navbera jin û mêran de.

Dema em rista jineolojiyê di avakirina şoreşa jinê de diyar bikin, divê em li gor van armancan bigirin dest.

### Şoreşa jinê mizgîniya avakirina civakeke demokratîk e

Rixmê hemû êrişên li ser jinan, bi pêşgtiya jinan helwesteke radîkal li dijî sîstema heyî û hişmendiya mêrsalarî heye. Lewra şoreşa



jinê, di şert û mecên şerê cîhanî yê sêyem de ku her roj berfireh dibe, dikare mizgîniya avakirina civakek demokratîk li Rojhilata Navîn bide. li kêleka ezmûn û destkeftiyên pir mezin divê em ji metirsîyê di kêmîna her şoreşê deye hişyar bin. Hewldanên sîstema kampîtalîsmê ew e ku hemû tevgerên îdeolojîk, siyasî û civakî yên dijber û alternatîv di nav pergala xwe de bihelîne û wan liberalize bike. Ji ber vê parastina nirx û destkeftiyên şoreşê bi qasî şoreşê bi xwe xwedî girîngiye û herî zêde dive jin xwedî li nirxê şoreşê derbikeve.

Derbarê girîngiya şoreşa zanista jin "Jineolojî" endama Navenda Jineolojî Nofa Elî û Jina entirnasyonal ya famînîst Mariya Karlos ji rojnameya me re axivîn.

Nofa Elî diyar kir ku zanista jin 'Jineolojî' cara yekem di sala 2008'an de ji aliyê Rêber Apo ve hatiye derxistin û wiha got: "Jineolojî yek ji zanist an nerînên Rêber Apo ku di derbarê civakê de daye. Û cara yekem di sala 2008'an de, di pirtûka Sisyolojiya Azadiyê ya Rêber Apo de hate pêşniyarkirin. Mirov bi kûrahiyekê li vê zanistê dinere. Rêber Apo dibêje wekî hemû zanistan, di zanistên civakî de jî vegotinên zilamtiyê mohra xwe lê dane, çawa ku rastî û heqîqeta çîn, desthilatdarî, zayendparestî, kuştin û hovitî hatiye veşartin, sitatûya rastiyê jinê jî 40 caran veşartî maye, lewra da xuyarkirin ku di dewsa famînîzmê de, zanista jineolojî were li dar xistin."

### 'Me şoreşê bi jinê dest pê kir û em ê bi jinê jî serbikevin'

Nofa Elî anî ziman ku Rêber Apo jiyan pêşkêşî jinê kiriye û wiha got: "Em nikarin bêjin ku Rêber Apo tenê zanistek pêşkêşî jinê kir, lê jiyan da jinê. Ji ber heta roja me ya îro jî, di hemû zanistan de jin tuneye. Mînak felsefe dibêje; jin zilamê kême, zanist dibêje; jin aqilê wê ji yê zilam kêmtire, ol dibêje; jin ji parsûyê mêr hatiye afrandin, ev nerînên cuda cuda di derbarê jinê de hatine pêşxistin û bi hezarê salan li derdorê jiyana jinê hatine meşandin. Lê Rêber Apo li dijî vê yekê derkert û got "Jin jiyan û yê ku jiyanê diafirîne, xweşdike û xwedî zaniste jine, ji bo wê jineolojî pêşkêşî jinê kir û gelek nerînan di derbarê jinê de dibêje; Jin nîvê civakê ye û nîvê din jî perwerde dike, hem jina azad civaka azad e, civaka jinên wê ne azad bin, ew civak nikare azad be, ji ber azadiya civakê bi azadiya jinê ye. Nerînên Rêber Apo ji bo jinê gelekî giranbûhane. Rêber Apo ji tişta herî biçûk heya herî mezin jin daye pêş, gelek şoreş li cîhanê pêk hatin, lê jin her dem li jêr bû, lê Rêber Apo got; Heger me şoreş di jinê de winda kiriye emê ji jinê dest pê bikin û bi jinê biserkevin."

### 'Şoreşa jinê derfeta ji bo jineke cuda afrandin'

Mariya Karlos di heman çarçoveyê de diyar kir ku ev nêzî salekê ye ew hatiye Rojava û wiha got: "Ez li Rojava di nava kar û xebatên cuda de kar dikim. Beriya ku ez bêm Rojava min şoreşa Rojava û fikir û felsefeya Rêber Apo kêmekî nas dikir, di heman demê de mîn hîs kiribû ku jinên kurd li dijî çeteyên DAIŞ'ê şer kirine, lê ne bi kûrahî min ev yek nas kiribû. Lewra min xwest ez ji nêz ve weke jineke elternatîf vê yekê baş nas bikim. Lê dema ku ez hatim derfet hebû ji bo naskirina şoreşa jinê. Ev şoreş di rastiya xwe de, çareseriye ji bo pirsgirêkên jinên cîhanî. Ji ber ev şoreşekî mirovahiyê ye, him têkoşînekî ji bo mefê jinê ye. Û di van 12'e salên şoreşê de gelek guhertinên mezin ji hêla jinê ve, ne di hêla şeklî lê di seranser de pêk hatin. Ji ber jin beriya şoreşê ji bo pespektîva jiyana xwe tenê di hundirê çar dîwaran de bû, lê piştî şoreşê û bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo derfeta ji bo jineke cuda hat afrandin. Bi taybetî zanista jin jineolojî ji bû min gelekî girîn û bi wateye, ji ber sîstema lîbiral û kapîtalîst dibêje; jin dikare azad be, ger ew wekî zilam be, lê di zanista jin jineolojî de min nas kir ku ji bo jiyaneke azad û wekhev pêwîste em têbikoşin."

**Ji Pênûsa Jin**

## Her têgeheke em bikartînin ne heqîqet e

**Nehîr Pale**

Jin intîhar nakin, wan dukjin; li gorî nêrîna min dema ku sîstema baviksalarî em fêrî bikaranîna gotina intîharê kirine, xwestiye em dûrî heqîqetê bimîn in. Sîstema baviksalarî ev gotin derxistiye û di mejiyê me de çandiye. Dema ku em dibînin an dibihîzin ku jinekê dawî li jiyana xwe aniye şûna em bibêjin jinê xwe intîhar kiriye divê em bibêjin me ew kuşt an jî wan ew dane kuştin. Ez çima vê yekê dibêjim? Ji ber hişmendiya baviksalarî ya di mejiyê bav û civaka cinsiyetparêz de derfet nade ku jin xweşiya jiyanê hîs bike yan jî bibîne, di her kêliya jiyanê de wê dişkînin. Li ser jinê ferz dikin ku di çarçevê qalibên ew datînin ji bo mêr bijî. Tu nirx û hurmetê nadin wê. Her tiştê jinê fîzîk, gotin, tevgerkirin eyb tê dîtin û wê tînin rewşa ku ji hemû tiştên xwe şerm bike. Rêbazên ku li hemberî jinê didin bikar anîn gelekî hişkin û rojane dilê jinê dişkînin û bê hêvî dihêlin.

Jin hîna di temenê biçûk de ye cudahî dixin navbera wê û lawikan de. Di xwarin û vexwarin, cilûberg, reng, nêzîkatî û hwd. Di her tiştî de mêr ji jinê çêtir dibînin. Jin heyanî ku saxbe di nava hewldanên ku xwe ji bo malbata xwe, hevjîn û civaka xwe isbat bike. Bi vê yekê re zextê lê dikin û di bin navê namûs û şerefê de zagonan jê re datînin. Eger wan zagonan pêk neyînê wê bi rêbazên xwe wê terbiye bikin.

Eger keç were dunyayê çima jê acizin û wê bela serê xwe dibînin? Şiklê jinê, bejna wê, qelewbûn û zeyîfbûna fîzîka wê, pora wê divê hemû li gorî daxwaza mêr be. Şerekî taybet ê giran li ser jinê tê meşandin. Kesek girîngî nade hest û mejiyê jinê, ji bo wan a girîng li gorî pîvanên wan be. Eger jin ne li gorî pîvanên ew dixwazin wê jiyanê lê bikin dojeh. Yê wê bînin asta xwe û cinsê xwe inkar bike, ji cinsê xwe hezneke û her tim hewl bide xwe bi mêr bide qebûl kirin. Ji ber vê yekê jinê fêrkirine ku tenê bi şiklê xwe ve mijûl bibe, bifikire çi li xwe bike, çawa bimeşe, kengî bikene û çi bêje. Hemû dûnyaya wê mêr e, ya girîng mêr wê qebûl bike û jê razîbe.

Di encama vê yekê de jin ji heqîqeta xwe dûr dikeve, bê armanc dijî, hêvî pêre namîne, coşa wê tine ye ku ji jiyanê hez bike û pêve were girêdan. Li beramberî zexta piskolojîk û tûndiya lê tê kirin mirinê ji xwe re çareserî dibîne. Ew difikire dema bimre êdî nema gotinên nexweş dibihîze, nema kesek tûndiyê lê dike û wê dawî li êşên wê were.

Civaka cinsiyetparêz bêwijdan nêzî jinê dibe wê tîne rewşa ku mirinê ji xwe re çareserî bibîne, piştre jî dibêjin wê xwe intîhar kiriye, li ser digrin, heyanî ji destê wan were destûr nadin ku kesek pê bibhîze û vedişêrin. Dîsa bi xwe difikirin û xema wan tenê berjewendiyên wan e.



# 'Bi hunerê re bijîn'

Şanoger Dilcan Oso diyar kir ku dema ew bi lîstikvaniya şanoyên xwe kêfxweşiyê derbasî dilê zarok û mezinan dike, ji bo wî wateyeke pir giring dide û hîz dike ku keda daye serkeftî ye.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Şanoya kurdî berî şoreşa Rojava û bi qedexekirina ziman, çand û hunera kurdî re, bi awayekî veşartî li malan prova dihat kirin. Piştî şoreşê bi awayekê balkêş pêşketineke mezin di warê şano û tevahî huneran de çêbû, gelek hunermend, şanoger û derhênerên ciwan hatin naskirin û bi nav û deng bûn, karîbûn di van salên dawî de xwe isbat bikin û bi hezaran şano, fîlm û rêzefîlm û hwd... çêkirin. Yek ji van ciwanên ku karîbû di nava şoreşê de xwe îsbat bike û bighêje armancê xwe, lîstikvan û şanoger Dilcan Osman Oso ye ku di sala 2001`an li bajarê Qamişlo ji dayikbûye û li taxa Hilêliyê dijî, derbarê xebat û jiyana xwe de ew ji rojnameya me re axivî. Dilcan Oso diyar kir ku wî di sala 2013`an dest bi xebata şanogeriyê kir û piştî şehadeta bavê wî yê şanoger, wî biryar da ku cihê bavê xwe di şanoyê de bigre û wiha got: "Ez di zarokatiya xwe de, bi bavê xwe re li pirova şanoyan bi bavê xwe re hazir dibûm, weke provên koma Bavê Teyar, bandora wan provan li min kir û hezkirinek ji bo şano li gel min çêbû. Di sala 2013`an ez tevlî navenda çand û huner ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo beşa şano bûm, Şevzan Mehmûd mamosteyê me bû, cara yekemîn ez daketim ser dika şano di Newroza sala 2014`an li Qamişlo bû, di şanoya bi navê( Gurê Waşûkanî) me pêşkêş kir, şano behsa destpêka şerê DAIŞ`ê dikir dema ket bajarê Serêkaniyê di riya axan de, di wê demê de gotina ku bala min kişand piştî şano bi dawî bû, beşdaravanan gotin îsal me Osman li ser dike dît wê çaxê bavê min şehîd ketibû, bi van gotinan armanc li gel min çêbû ku min karîbû şûna bavê xwe bigrim û navê wî berdewam bikim."

### 'Em karin şano û lîstikvaniya kurdî bighînin cîhanê'

Dilcan Oso wiha anî ser ziman: "Ji destpêka ez ku tevlî şano bûm heta roja îro, ez tevlî gelek şano, fîlim û belgefîlman bûm û hin ji wan nivîs û derhêneriya min bû. Hedef û armanca min ku em karibin şano û lîstkvaniya kurdî bighînin cîhanê, ji cîhanê re bêjin em li Rojava xwedî zimanin û di rêzefilman, fîlim û şano de cihê xwe digrin. Herwiha ciwan û zarokên derdora xwe fêrî şano bikin û bighêjin asta ku îro em gihşatinê û ji vê xebatê hez bikin."

### 'Em di qûnaxeke nû derbas dibin di beşê şano de'

Dilcan Oso bal kişand ser lawazbûna beşa şano li tevahî cîhanê û bi taybet li rojava û wiha anî ziman:" Destpêka şoreşê gavên pir mezin hatin avêtin tevlî şahî û Newroza bûn û herî dawî festîvalên şano hatin li dar xistin, hejmara festîvalan gihaşt 6 fastîval û zêdtir 5 fastîvalên zarokan hatin li dar xistin. Di dema heyî de qûnaxeke nû çêdibe divê kampaniyên taybet vê xebatê bên avakirin da ku kesên şanoger û lîstikvanên di vê hunerê de sûdeke menewî û madî jê bigrin, û ji wan re bibe xebatek taybet berovajî niha ku şano karekî duyemîne li gel karê xwe yê sereke di jiyana şanogeran de, ev jî bi sedema şer û rewşa aborî ya zehmet, dema ku her yek xebata xwe bike lîstikvan karê xwe bike di heman demê de derhêner di vê demê de emê karibin xwe bighînin tevahî cîhanê."

### 'Girêdaneke min bi tepa şanoyê re heye'

Dilcan Oso wiha berdewam kir: "Dema ez şano pêşkêş dikim ez dibim kesayetek din, ez hîs dikim ku gelek jiyanan dijîm. Girêdaneke pir mezin bi tepa şano çêbû. Dema ku karê min tune be jî ez diçim navendê û li ser tepê rûdnim û di nava xwe de dibêjim ku vê tepê çiqas hêz û bawerî da min û ev şoreş çiqas derfet da min ku bibim şanoger û lîstkvan, ez pir kêfxweş dibim dema ez mirovekî dikenînim di riya şanoyê de ku kaîrbim bighêjim hestên wan kesên temaşevan".

### Berhemên xebata şano

Dilcan oso wiha domand:"Heya niha weke şanoger û lîstikvan 36 şano min çêkir bi zimanê kurdî û erebî ji wan skêtş û şanoyên dirêjin, zêdetirî 54 karekter min lîstiye li gelek bajarê Rojava hatin pêşandin. Di sala 2023`an di festîvala şano de ya şehîd Yekta Herekol ya 6`mîn li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê di şanoya bi navê(Kevir û taxa ji bîr kirî) xelata baştrîn lîstkvanê diyarî min hate kirin, ji bo min pir pîroz bû keda min ya salan di vê festvalê de derket, herwiha 4 belgefilm û 4 filmê min hene bi nivîs û derêneriya min".

### Şano bandoreke erênî li civakê dike'

Dilca Oso wiha got:"Şano bandoreke



erênî li ser civakê dike bi taybet fîlim ji ber ku gelek kes lê guhdar dikin, kesên ku di destpêka şoreşê bûn rewşenbîr, şervan sedema yekemîn şano bû ji ber ku şano fêrkirin û dibistaneke xelkê fêrî jiyanê dike weke dibêjin şano rasteqîna jiyanê û neynika civakê ye êrînî û neyîniya civakê vedibêje. Ji nifşên nû re dibêjim ji hunerê hez bikin û pê re bijîn".

### Ji bo xebata pêşerojê

Dilcan Oso di dawiya axftinên xwe behsa xebatên xwe yên bê kir:"Komek ya zarokan heye bi navê( koma şehîd Osman) ez wan fêrî şano dikim, sala çûyî di fesîvala Rimêlan de a zarokan şanoya bi navê (zimanê kurdî) pêşkêş kirin, niha jî em hazirtiyê xwe dikin di 23-24 vê mehê wê şanoyekê nû pêşkêş bikin ji zarokan re bi navê (Xwendin) bi derênertiya min. 4 fîlimên min yên televîzyonê hene sînaryoya wê bi dawî kiriye, min pêşkêş aliyekî kiriye dibe ku di meha 9`an de em dest bi wênekêşiyê bikin. Herwiha zêdtirî 7 sînaryo yê sînama min nivîsandiye yek jê behsa komkujiya ermeniyan dike, hinek kêmasî hene weke piştgiriya madî ji me re nayê pêşkêş kirin ev dihêle ku keda me paş ve biçe ji ber ku di cihê xwe de dimîne."

# Hazirtiyên Festîvala Mono Drama

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

**Komîna Şano ya kantona Cizîrê ragihand ku ew ê bi navê ( Mono Drama) festîvalekî li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dar bixe. Armanca wê jî xurtkirina rola lîstikvan û derhênerên şanoyê. Li ser vê bingehê ji 15'ê Îlonê û heta 5'ê Cotmehê nivîsên şanoyê tên pêşwazî kirin.**

Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê amadekariyên festîvala (Mono Drama) tê kirin ku yekemîn car wê li herêmê bê lidarxistin. Mono Drama cûreyeke şanoyê ye, tenê lîstikvanek şanoyê dilîze li ser tepa şanoyê, carnan bi alîkariya çend lîstkvanan tê li dar xistin, lê divê bêdeng bimînin. Mono peyveke Yûnanî ye tê wateya yek. Derbarêamadekariyên Festîvala Mono Dirama endamê komîteya amadekar Enwer Mihemed ji rojnameya me re axivî.

### Girîngiya lidarxistina festival



Enwer Mihemed di dstpêka axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya festîvalê û wiha got: "Festîvala Mono Drama tê wateya ku lîstkvanek şanoyê pêşkêş bike, ev cûr jî xwe dispêre hewildanên derhêne an lîstkvan. Her sal di 27`ê Adarê de festîvala şanoyê ya Şehîd Yekta Herekol tê li darxsitin, di vê festîvalê de nivîsên Mono Drama ji me re dihat lê me qebûl nedikir, ji ber ku festîval ya koman bû, gelek şanoger bi hev re pêşkêş dikin. Me rewş lêkolîn kir û dît ku giringiyeke Mono Drama heye mîna yên din, ji be vê yekê em ê hewil bidin vê festîvalê li dar bixin. Ji sedemên li dar xistina festîvalê; Pêşkêşkirina piştgiriyê ji bo lîstkvan û derhêneran da ku xebtên xwe pêşkêş bikin, festîvalên mîna Mono Drama ji bo xurtkirina lîstkvanan roleke mezin dilîze."

### Ji tevahî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlîbûn heye


Enwer Mihemed wiha domand: "Ji destpêka festîval hate raghandin, gelek têkilî ji hêla derhêner, nivîskar û lîstkvanan bi komîteya amadekar re ji tevahiya bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate kirin, herwiha nivîsên xwe ji bo tevlîbûna festîvalê pêşkêş kirin. Tîmek ji Şanoya Netewî li Şamê û jineke ciwan ji Ewropayê xwesteka wan di tevlîbûnê de heye û festîval Jî êdî wê pêşwaziya wan bike."

Enwer Mihemed balkişand ser nivîsên go tên qebûlkirin û wiha got: "Gelek nivîs hatin lêkolînkirin, yên herî guncaw hatin erê kirin. Komên hatin erêkirin wê ji bo amadekirina şanoya xwe kar bike, duvre jî wê komîteya temaşekirinê van şanoyan binirxînin di dema provên ku çêbibin. Dibe ku festîval di meha Berfanbarê de bê lidarxistin."

Enwer Mihemed derbarê cihê lidarxistina festêvalê de wiha got: "Tevî ku me cihê festîvalê diyar nekiriye, lê dibe ku li navenda Mihemed Şêxo bê lidarxistin. Ji hêla piştgiriya darayî ve jî hîn pilan berdewam in ji bo peydakirina pêwistiyan, lê organîzatoran tekez kirin ku ew ê dudilî nemînin di pêşkêşkirina piştgiriya manewî û darayî ji bo tîmên ku beşdar bibin, di nav de peydakirina wesayîtên çûn û hatinê û alîkariya lojîstîk."

Endamê Komîteya Amadekar ya Festîvala ( Mono Drama) ya yekemîn li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Enwer Mihemed axaftina xwe wiha qedand: "Festîvala Mono Drama yê yekemîn li Bakur û Rojhilatê Sûriyê projeyeke mezin e, pêwistiya wê bi hewildanên mezin hene li ser tevahiya waran. Tê payîn ku ev festîval xaleke veghurandinê be di xurtkitina şanoya tekkesê, û piştgiriya tevgera şanoyê li herêmê."

**Têbînî**



## Berhevkirina Gotinên Pêşiyan Karê Bêkaran..!!

**Kemal Necim**

Di salên dawî de, bi pêşketina tevgera çap û weşanê re, gelek pirtûkên pend û şîretan yan jî gotinên pêşiyan derketin. Weke gelek xebat û çalakiyên din ên nivîsîn û dahêneriyê, ev pirtûkên pend û şîretan jî bê serûber dikevin pirtûkxaneya kurdî û êdî karê berhevkirina pendan bûye karê bêkaran.

Pen û şîret, yan jî gotinên pêşiyan, biwêjeke navdar e ku behsa serpêhatiya gelan dike û ji pêşiyên berê hatiye girtin. Bûyerek e, çîrokek e ku bi çend peyvan bi ferhengek hêsan tê şîrove kirin ku wateya wê ji hêla her kesê ku dibihîze tê naskirin e. Pend, gotinên kurt in, bi wateya şîretan e, ku dikarin ji me re bibin alîkar ku di rewşên tevlîhev de biryarên baş bidin. Ji ber vê yekê, ew dikare bibe rêbaza reftarên kes û civakan, lewma ji bo civakan girîng e. Pend û biwêj tevnek çandî ya hêja ye, mirov wan pendan weke rêbazên jiyanê û têkilî û reftarê dibînin û hewil didin tiştên baş û yên xerab ji hev nas bikin, tiştên xerab ji civakê dûr bixin û tiştên baş biçesipînin. Gotinên pêşiyan beşeke bingehîn û girîng ê çanda mirovahiyê ne. Ew pend rengvedana ezmûna jiyana demdirêj ya mirovahiyê ye, çawa bi demê re mirovan ezmûn derbas kirine û berhev kirine û weke pend û şîret ji xwe re kirina rêbaza jiyanê. Her wiha bi rêya van pendan mirov dikare reftar û kevneşopî û pîvanên sincî yên civakên din nas bike. Pend û şîret bi hezarê salan ji nifşekî gihiştine nifşê din û bi gelek şêwe û ziman û zaraveyan hatine hûnandin û gotin, ku bûne alava çandin û çesipandina nirxên bi rûmet û rastkirina reftar û tevgera kesan.

Pend û şîret yek ji nirxên ramyarî û wêjeyî yê civak û gelan e, her civakek û her gelek, li gorî çanda xwe, nirxên xwe, bîr û baweriyên xwe, awayên jiyana xwe û şêweyên derbirînê û ziman û zaravayên xwe bi sedan pend û şîret hûnandine û gotine û bi sedên salan parastine. Civaka kurdan jî her wiha di pêvajoyên dîroka xwe de bi hezaran pend û şîret û gotinên pêşiyan afirandine û ji nifşekî radestî yê din kiriye heta roja me ya îro hatine. Lê mîna pir nirx û afrêneriyên devkî, ev berhem jî eger neyên parastin, nivîsîn û berhevkirin û belgekirin, dê roj bi roj winda bibin û tune bibin.

Lê pir pêwîst e ku kar û xebatên berhevkirinê û nivîsîn û belgekirinê bi awayên zanistî, rêkûpêk û têkûz bêne kirin. Heta niha bi dehan pirtûkên bi navê (Gotinên Pêşiyan) hatine çapkirin û belavkirin, lê piraniyan wan ne bi rêbazên zanistî hatine berhevkirin. Xuaye ku hin kesan, yan jî hin rewşebîran, ev karê berhevkirina pend û şîretan weke karekê hêsan û bêwestan dîtine, ji xwe re çend pirtûkan tînin ber hev, ji çend kal û pîran dipirsin û heme pirtûkekê çêdikin. Di encama van xebatên bêserûber de, şêweyê hûnandina pir pendan hatiye xerabkirin, wate hatine guhertin, carna jî pendên biyanî weke pendên Kurdî hatine nivîsîn û HWD. Xebata berhevkirina pend û şîretan xebateke zanist û lêkolînê ye, pêwîste nebe karê bêkaran.

# Projeya piştgriya civakî ji bo nexweşên Telasîmiya

**Ji bo peydakirina pêdiviyên bijîşkî bi taybet ji bo nexweşên penceşêrê û zarokên telasîmiyayê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Heyva Sor a Kurd rêbazeke piştgiriya civakî ji bo nexweşxaneya Onkolojî, Telasîmiyayê û şewatê ya li bajarê Qamişlo pêş xist.**

**Navenda Nûçeyan**

Li tevahî dewletên cîhanê alîkarî û piştgiriyên mirovî ji bo nexweşiyan û nexweşan tê pêşkêşkirin ji hêla Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanî ve, lê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ber neqebûlkirina Rêveberiya Xweser û saziyên girêdayî wê, di nav de navend û rêxistinên tenduristî, alîkarî nayê pêşkêşkirin. Nexweşên telasîmiyayê hewcdarin ku bi awayekî rêxistinkirî û bi ewle xwîn ji wan re bê veghustin. Ji ber rewşa şer li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û nepêşkêşkirina alîkariyê ji hêla rêxistinên girêdayî tenduristiyê yên navdewletî rewşa nexweşan aloz dibe, bi taybet nexweşên telasîmiya ku pêwîste bi awayekî rêxistinkirî xwîn ji wan re bê pêşkêş kirin, tevî kêm derfetan Heyva Sor a Kurd bi hemû rêbazan hewil dide xwîn û pêdiviyên din ji bo nexwşan peyda bike.

Ji destpêka avabûna Heyva Sor a kurd tu piştgiriyeke rastersat jê re nehatiye pêşkêşkirin, ji ber şert û mercên jiyanî yên zehmet, buhabûna çûn û hatina ji bo dermankirinê li herêmên din, bûhabûna dermanan Heyva Sor a kurd pêwîstî dît ku nexweşxaneyeke Onkolojî, telasîmiya û şewatê bê vekirin, da ku xwedî li gel û nexweşên xwe derkeve. Bi vê yekê barê Heyva Sor a kurd giran bû ku van pêwistiya hilgire ser milê xwe. Weke saziyeke bi tena sere xwe ev erkê mezin bi cih anî, bêyî destekdayîna tu aliyekî.



**Projeya piştgiriya civakî**

Da ku Heyva Sor a Kurd destek û alîkariyê ji bona nexweşxaneyê û pêşwaziya tevahî nexweşan ji hemû herêman bike, projeyeke piştgiriyê bi destekdayîna gel re da destpêkirin. Ji serê salê ve planek hate çêkirin ku projeyeke piştgiriya civakê ji bo alîkariya nexweşan bê kirin û ev pênc mehin ku ev piroje ketiye meriyetê. Ev proje di riya komîteyeke navendî û îdarî de û ji bona ku xebateke berbiçav li ser erdê bê kirin û tu şaştî dernekeve û ev xebat bikeve xizmeta nexweşxaneyê kar û xebat bê navber tê meşandin.

Projeya piştgiriyê bi alîkariya gel tê kirin, sindoqên xwebexş li firoşgeh, market, saziyên sivîl û civakî yên herêmî ku civak pê re eleqdar dibe, li van cihan sendoq hatine danîn û gelek kes bûn alîkar ji bo temamkirina vê projeyê. Derdora 70'î sindoqî li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate danîn. Bajarên ku sindoq lê hatin danîn evin (Dêrik, Tirbespiyê, Girkê Legê, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Til Temir, Hesekê, Dêra Zorê, Minbic, Reqa, Tebqa û Kobanê bûn). Dibe ku hejmara sindoqan zêdetir bibe ew jî wê li gorî encamên ku ji vê pirojeyê were girtin be.

**Sîstema projeyê**

Li cihê ku sindoq tê danîn hevpeymanek di navbera her du aliyan de tê îmze kirin, da ku her cara ku sindoq bê vekirin her du alî bi hevre beşdar bibin, lîsteyek heye her cara ku sindoq bê vekirin nirxê ku hatiye komkirin tê nivîsandin. Sindok her du mehan carekê tê vekirin, her cara ku sindoq bê vekirin derman û pêwistiyên bijîşkî yên ku wê werin kirîn bi raporeke fermî di riya daxuyaniyekê bi gel re wê were parve kirin.

Li gorî endama Rêveberiya Heyva Sor a Kurd Sozsa Iko wê proje bi rengekî domdar berdewam bike û wiha ji rojnameya me re diyar kir:" Di cîhanê tevahî de ji bo mîna van nxweşiyan piştgirî ji hêla Rêxistina Tunduristiya Cîhanî ve tê pêşkêş kirin, lê ji ber neqebûlkirina Rêveberiya Xweser û saziyên girêdayî wê tu destekdayîn nayê kirin. Ji ber vê yekê em neçar dimînin ku mîna van projeyan raghînin, ji xwe projeya me wê berdewam be, eger di pêşerojê de alîkarî bê pêşkêşkirin dibe ku pilana vê projeyê bê guhertin, lê li gorî derfet û dema heyî ev proje domdare.

**Qebûlkirna gel ji projeyê re**

Gelê herêmê piştgriya xwe diyar kirin û kêfxweşiya xwe anîn ziman, bi raghandina mîna vê projeyê re, destekê didin projeyê, li gorî ev cara yekemîne ku dest bi vekirina sindoqan hatiye kirin, encam baş tê xuya kirin, lê divê gel zêdetir alîkariyê bike, nas bikin ku ji bo çi ev proje hatiye destpê kirin. Gelek insyatîf ji bo pêşketina vê projeyê û projeyên din ku alîkariya nexweşan bike û bikeve xizmeta wan tê dayîn, di pêşeojê de wê bên ragihandin.

**Nexweşxaneya Onkolojî, Telasîmiya û Şewatê**

Nexweşxaneya Onkolojî, Telasîmiya û Şewatê ji hêla Heyva Sor a kurd di dîroka 12-17-2023'an hate vekirin, di nexweşxaneyê de sê beşên sereke hene, ( Telasîmiya, Penceşêr û Şewat), beşa şewatê amade ye lê ji ber îmkanên madî hatiye sekinandin. Beşa penceşêrê jî ji destpêka vekirina nexweşxaneyê ketiye meriyetê, ya telasîmiya vekirina wê nehatiye raghandin, lê ji destpêka vekirina nexweşxaneyê pêşwaziya nexweşan dike.

**Beşa Telasîmiya**

Di nexweşxaneyê de nexweşên Telasîmiya tên pêşwazîkirin û derman kirin, rêjeya mezin ji nexweşên telasîmiya kategoriya zarokane, 170 nexweşên telasîmiya hene, bi awayekî mehane ji carekê heta du caran li gorî rewşa nexweşan li nexweşxaneyê vedgerin da ku xwîn bê veghustin.

**Xizmetên ku ji nexweşan re tên pêşkêş kirin**

Muayeneya Tibî, testên tibî û derman bê dirav ji bo nexweşan tê pêşkêş kirin. Du bijîşkên taybet yên nexweşiyên xwînê hene, bi nexweşan re têkildar dibin, xwîn tê peyda kirin ji bo nexweşan. Ji bo banka xwînê tê amadekirin û wê di demek nêz de bikeve xizmetê.

# Gelê Amazî û bandora wan a li ser çanda gerdûnî (2)

**Volqan Elî**


Di sedsala 8'emîn de şaristaniya Îslamê, di bin navê dewleta Emewî de xwe rêxistin kiribû. Heta Bakurê Afrîka xistibû destê xwe. Dema ku belavbûna vê şaristaniyê gihaşt hetaa bi astekê , êdî berê xwe da parzemîna Ewrûpayê. Fermandarê artêşên Emewî yê ku di tengava Cebelî Tariq (jixwe navê vê tengavê piştî wî bûye 'Cebelî Tariq') re derbas bûbû, Tariq Bîn Ziyad bi xwe Amazî ye. Wekî tê zanîn piştî ku artêşên Emewiyan derbasî Ewrûpa-Îspanyayê bûn, Endulusa bi Emewiyan ve girêdayî ava kirin. Dema ku Ebasiyan dawî li dewleta Emewî anîn, Endulus wekî erdnîgariyeke cuda hebûna xwe domandiye. Dîsa di heman serdemê de civaka Amazî li Mexribê, dewletek ku navenda wê Merekeş e çêdikin. Ev, li her du aliyên tengava Cebelî Tariq xwe bi rêxistin dike; di parastina Endulusê de bi roleke girîng radibe. Hin rewşenbîr vê rola gelê Amazî (di şaristaniya Endulusê de rola Amaziyan, dewleta Miratib û hwd) di parastin û pêşxistina çanda îslamê de, bi rewşa Selehadînê Eyûbî yê Kurd re didin ber hev. Ji ber ku di dîrokek cuda de (sedsala 12'emîn) de, Selehadînî Eyubî jî êrîşên Seferên Xaçiyan ên li ser Rojhilata Navîn têk dibe.

Wekî Tariq Bîn Ziyad ku fermandarê wê demê ye û artêşên Îslamê bi saxlemî gihandiye erdên Ewrûpa, bi xwe Amazî bûye, gelek leşker, hunermend, zeneatkar û cotkarên şaristaniya Endulus a Emewiyan jî Amazî bûne. Avabûna Endulus, di çêbûna şaristaniya Ewrûpaya îro û çanda gerdunî de tê zanîn. Ji ber ku mijara me ne bi taybetî dîrok û çanda Endulus e, ne hewce ye em mijarê zêde dirêj bikin. Lê em dixwazin pir sînordar be jî balê bikişînin ser çanda Endulusê. Di sedsala 11'emîn de hêzên hegemonîk ên wê serdemê yên Ewrûpî, piştî şerên dûr û dirêj şaristaniya Endulusê hildiweşînin. Gelê Misilman ê Endulusê di qetlîamê re derbas dikin. Yên mayî mişaxtî dikin. Îro hê jî li Îspanyayê mizgeft, kumbet, turbe, û bermahiyên dîrokî ku ji aliyê gelên Ereb, Amazî hwd ve hatine çêkirin li ser piyan mane. Dema Endulus tê hilweşandin, li bajarê Granada di kutupxaneyekê de milyoneke pirtûk hebûye. Wan pirtûkan tînin, li meydana bajêr a bi navê Babûr dişewitînin.

Ji vê karasata dîrokê tenê beşeke pir biçûk a pirtûkan xelas dibe. Di vê derbarê de fîzîknasê Fransî Pierre Curie di destpêka sedsala 20. de wisa dibêje; "Ji Endulusa Misilman ji me re 30 hezar pirtûk maye; me karîbû atomê parçe bikin. Eger bi qasî nêviyê wan mayiba me yê karîba ji mêj ve di navbera galaksiyan de rêwîtî bikin". Dîsa di van pirtûkan de agahiyên li ser astronomiyê, çîrok, kronolojiya qralan, qural û qeîdeyên bazirganiyê û kirîn û firotinê hebûye. Li Endulusê asta perwerdeyê ewqas li pêş bûye ku piraniya gelê wê xwende bûye. Wê demê li Ewrûpayê tenê çend kesên li derdora qral û prensan xwendin û nivîsandinê dizanin. Ev mîrasa zanistî û çandî paşê li Ewrûpayê ji bo ku tevgera ronesans, reform û ronahîbûnê (ji sedsala 15.-16.-17'emîn pê de) bi pêş bikeve, bi roleke girîng rabûye. Asta zanist, huner û felsefîk a îro li cîhanê heye, bi vê pêngava dîrokî re rasterast girêdayî ye. Dema em vê rastiyê bînin bîra xwe, rola vî gelî di çanda cîhanî de hema ji ber xwe ve tê fêmkirin.

Ev nayê maneya her tiştê baş ê Endulisê, Amaziyan afirandiye. Jixwe hêza sereke ku Endulusê ava dike, motîve dike ol û manewiyata Îslamê ye (her çendî Emewiyan cewhera paqij ya Îslamê ji bo dagirkeriya xwe, ji bo berjewendiyên xwe bi kar dianî jî). Endulusa Emewî jî wekî împaratoriya merkezî ya Emewî, her tiştê Îslamê xistibû xizmeta qral û siltanên xwe; ji xwe re digot "ez dewleteke Îslamê me û ji min pê ve ti kes ne li ser rêya Xwedê ye" (hemû hêzên dagirker dişibin hev, îro jî dagirkeriya Tirk wisa dibêje) Aliyekî şaristaniya Endulusê ev bû, lê piraniya leşker, cotkar, hunermend, zanyar û gelê Endulêsê Amazî bû. Lewra dema ku erdnîgariya Amazî (Bakurê Afrîka, Endulusa wê demê) lê dijîn, li ber çavan tê girtin, rola dîrokî (ji bo şaristaniya Ewrûpa û cîhanê) ya gelê Amazî ti delîl û îsbatan naxwaze.

## Xwenasîn



### Bajar bê çand nabe

**Rohat Bulut**

Yek ji hêmayên ku civakbûyînê pêk tîne çand. Çivakeke bê çand nepêkan e. Lê di heman demê de bi pêşketina bajarvaniyê re ew çanda civakî rojane heliya. Pergala hegemon û hêzên serdest her tim ji xwe re kirin armanc ku çand û civakbûyînê ji holê rabikin. Mirov dikare bêj e heta astekê jî bi ser ketin. Lê belê hişmendiya civakî û saziyên civakê bi derfetên xwe hewildidin pêşî li van êrîşên li ser çand û civakê bigirin.

Rêveberiyên civakî yên pêywridar di vî warî de xwedî rist û berpirsyariyeke girîng e. Di warê çandê de peywirên zehf girîng ên şaredariyan hene. Pêwîste ku şaredarî bi berpirsyariyên xwe yên ji bo civakê rabe. Li gel saziyên civakî û çandî ya pêwîst şaredariyên derfetan veqetîne û di her warî de bi van saziyan re di nav dan û stendinê de be. Bi taybetî jî derfetên madî hinekî li ser şaredariyan dikeve. Bi taybetî ji bo şano, konser û pêşandana hunerê avakiririna sazî û dezgehan gelekî girîng e. Di heman demê de organîzekirina xebatên çand û hunerî bi serê xwe tiştekî pêwîst e. Lewre ev kar û xebat ji xweber pêş nakeve pêwistî bi organîzekirinê heye.

Dîsa dema em lê dinêrin ji bo parastina berhemên dîrokî pêwistî bi cihên wekî muzeyan heye. Teqez divê muze hebin ku ew bîr û hafîzaya civakî lê bê parastin. Ev qad dibe cihê paşeroja civakê. Bi saya van cihan her nifşên nû yên civakê ji çand, dîrok û paşeroja xwe haydar dibin. Pêşandana her berhemên li muzeyan dibe sedema ku mirov paşeroja xwe bizanibe.

Her wiha vekirina galeriyên hunerê ji bo hunermendan dibe qadeke pêşandana hunera xwe. Ev ji bo civak û hunerhezan dibe derfetek. A pêwîst jî ew e ku hunermend derfetê pêşandana hunera xwe dibîne. Bê guman civak jî li galeriyên hunerê ji hunera hunermendên xwe haydar dibe. Heke civaka ku hunermend lê pêşketî be û eleqeyek ji bo hunera wan hebe ew civak di bingeha xwe de civakeke pêşketî ye.

Li aliyê din jî pêwîste di warê nivîskî de qîmetdayînek ji xebatên nivîsî û çapî hebe. Belê her berhema ku bê çabkirin divê bi nirx be û di nav civakê de xwedî cihekî giring be. Divê civak dikaribe bi hêsanî xwe bigihîne van berheman. Lewre jî ya pêwî divê pirtûkxane bên avakirin. Di van pirtûkxaneyan de pêwîste civak xwe bigihîn e her cure agahiyan.

Bê guman ji bo her kar û barên bê kirin divê teşwîqek hebe. Ev yek jî ji aliyê şaredariyên gel û saziyên civakî ve divê bê kirin. Teşwîqkirina karûbarên hunerî gelekî gîringe ku pêş bikeve. Naxwe ew civak ya dê bê çand û huner bimîn e yan jî dê ji çand û hunera xwe bêpar bimîn e ku li şûna wê dê çand û hunera serdestan serwer be. Ev jî tê wateya tunekirina nirxên civakekê.

Belê hemû çalakiyên çandî yên wekî organîzekirina şahiyan û çalakiyên werzîşê karûbarên mecbûrî yên rêveberiyên herêmî ne. Parastina her cure nirxên civakî di bingeha xwe de parastina civakî ye. Ev bi qasî berpirsyariya rêveberiyên herêmî di heman demê de berpirsyariya her ferdên wê civakê ye. Heke di vî warî de serkeftin hebe dê civak li hemberî her curê êrîşan bi ser bikeve. Bi taybetî jî li cihên wekî bajaran divê ev çand bê parastin. Lewre bajar bê çand nabe.



# Kobanê ne ket, serket... (1)

**Di Tîrmeha 2014'an de, bi zêdebûna êrişên çeteyên DAÎŞ'ê li ser Kobanê seferberî hat ragehandin. Piştî ragehandina seferberiyê hevserokatiya Rêveber a KCK'ê jî, di 7'ê Pûşbera 2014'an de ji tevahiya gelên Kurdistanê xwest ku piştgiriyê bidin seferberiyê. Piştî banga Rêber Apo bi taybet Bakurê Kurdistanê ket nav hewldanên mezin.**

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Cengawerên parazvanê Kobanê ji çeperên berxwedanê diqîriyan. Li serxetê gelê berxwedêr bersiva wan didan: "Wê Kobanê nekeve… Ala berxwedanê wê her tim li ba be…" Ev bersiva gelê Bakurê Kurdistanê berxwedan bêhtir watedar dikir, cenga li dijî çeteyan geş dikir. Bi carekî serê xwe rakirin rêhevalên Arîn û Gelhat'an. Van rojan yek ji mijarên ku herî di rojevê de ye dîsa berxwedana Kobanê û doza Kobanê yê ku li dijî siyasetmedarên Kurd hatiye vekirin e. Kobanê bûye kulek wisa di dilê dagirkerên Tirk û rêvebirên wan de ku di ser rizgarkirina wê de ewqas sal jî derbas bûyê hê jî ji dilê wan derneketiye. Ew gotina Erdoganê faşist a "Îro sibe, Kobanê hat ket ha dikeve…" dema li wan çep vegeriya û Kobanê neket, dagirker gelek aciz kir. Lewma niha piştî ewqas sal dixwazin tola binketina çeteyên xwe li siyasetmedarên Kurd û dostên wan vekin.

**Bangawaziya Rêber Apo bû fermanek ji bo parastina xaka Kurdistanê**

Hikumeta AKP'ê ya ku xeyal dikir ku pêşî li pêşketinên Kurd ên li Rojava bigre, bi destê çeteyên DAÎŞ'ê li dijî bajarê Kobanê plana xwe amade kiribû. Li gorî plana AKP'ê û DAÎŞ'ê; dê Kobanê bi dest bixin û bi qetlîmên ku li wir pêk bînin îradeya berxwedana Rojava bişkînin. Bi vê armancê di sala 2014'an de çeteyên DAÎŞ'ê bajarê Kobanê dorpêç kirin. Ji aliye sînorê Bakurê Kurdistanê ve jî artêşa Tirk a dagirker bi dorpêça xwe piştgirîyeke mezin dida çeteyên DAÎŞ'ê. Serokomarê Tirk Recep Tayîp Erdogan jî dê di axaftineke xwe ya di 7'ê Cotmehê de bi gotina "Kobanê ber bi ketinê ve ye" ev piştgiriya dewleta Tirk a DAÎŞ'ê aşkere kir. Piştî daxuyaniya KCK'ê jî, li gelek deverên Kurdistanê gelê kurd ji bo piştgiriyê bide Kobanê dest bi çalakiyan kirin. Ji bo piştgiriyê, di 9'ê Tîrmehê de ji navçeya Pirsûsa Rihayê meşeke girseyî pêk hat. Piştî vê meşe li gundê Ziyaretê welatî bi konvedanê dest bi nobetê kirin. Ev çalakiyên gelê Kurd bi banga seferberiyê ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a 15'ê Tîrmeha 2014'an ve bilindtir bûn. Banga Rêber Apo bandor li rihê berxwedêr ê gelê Kurd kiribû. Ji Rojhilat heya Başûr, ji Bakur heya Ewropayê gelê Kurd û dostên Kurdan bi armanca piştgiriya Kobanê dest bi çalakiyên girseyî kirin. Li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê jî gel ji bo Kobanê rabû ser piyan. Li Kerkuk û Qaledizê çalakiyên girseyî hatin lidarxistin. Dirûşmeyên "bijî berxwedana Kobanê" ji navendên wekî Ciwanro, Sinê, Mahabadê, Kirmanşah, Urmiyeyê digihîşt bajarê Silêmanî. Çalakî û greva birçibûnê ya ku di Tehranê destpêkir bi rojan dewam kir. Bi taybetî Bakurê Kurdistanê, ji bo bersiv bide banga rêberê xwe ket nav hewldanên mezin. Partiya Herêmên Demokratîk DBP jî guh da banga Rêber Abdullah Ocalan û berê hemû şaxên xwe da navçeya Pirsûsê. Bi sedan ciwan, bi banga Rêber Abdullah Ocalan re li gel astengiyên dewleta Tirk, sînor nasnekirin û tevlî berxwedana Kobanê bûn. Çalakiyên ku ji Kurdistanê destpêkirin, di demek kin de belavî bajarên Tirkiyeyê û cîhanê jî bûn. Li gelek deverên cîhanê, dost û hevalên Kurdan bi gelê Kurd re bi çalakiyan bersiv dan banga seferberiyê.



**6'ê Cotmehê: Kêr giha hestî, pêwîst bû dagirker têk biçin**

Çalakiyên ku her ku diçû mezintir dibûn, li Bakurê Kurdistanê di 6'ê Cotmehê de veguhirîn serhildanan. Li deverên wekî Bismil, Şemzînan, Cizîr, Sêrt, Gever û Stenbolê ciwanên Kurd çalakiyên bi bandor pêk anîn. Welatiyên ku ji Cizîra Botan ber bi sînor herikîn, têlên li ser sînor derbas kirin û sînor bê wate kirin. Ji bo Kobanê li bajarên Serhedê jî gel rabû serhildanan. Lê hikumeta AKP'ê bi qetlîaman bersiv da van serhildanan. Serhet bû agir û rabû ser piyan. Li navendên wekî Bazîd, Îdir, Kop, Melezgirt, Varto, Wan, Erdîş, Elbak û Bêgirî gel bi rojan li hember hêzên AKP'ê ve ket nav pevçûnan. Navçeyên Qereyazî û Tatos ên Erziromê jî ji serhildên paşve neman û qadên van navçeyan bûn qadên serhildanê. Li Erziromê faşîstan bi çekan êrîş bir ser xwepêşanderan û sê kes birîndar bûn. Li Erdîşê qedexeya derketina derve hate ragehandin. Helbet weke gelek caran evcar jî navenda serhildan û berxwedanê bajarê Amedê bû. Polîsên AKP'ê bi rojan li hember serhildanên gel nekaribûn bikevin taxên bajêr. Gelên Amedê bi rihê berxwedêr ê ku li zindanên Amedê hat afirandin, daket kûçe û kolanan.

Li navçeya Nisêbîn a Mêrdînê jî, sînorên ku di navbera Qamişlo û Nisêbînê de ji aliyê gel ve hatin rakirin. Serhildanên gel ne tenê li bajarên Kurdistanê pêk dihat. Li bajarên wekî Îzmîr û Stenbolê jî Kurd û dostên Kurdan bi çalakiyên xwe piştgiriya berxwedana Kobanê û serhildanên ji bo Kobanê kirin. Çalakiyên ku di 6'ê Cotmehê de pêk hatin di destpêka serhildanê de nîşan dida ku dê hesabên AKP'ê yên li dijî Kobanê vala bên derxistin. AKP ya ku fêm kir dê li hember serhildanan têk biçe, bi hemû hêzên xwe yên fermî û paramîlîter dest bi êrîşan kir. Di vê pêvajoya ku di 6'ê Cotmehê de destpêkir de li dijî serhildanên gel, hêzên dewletê bi hêzên paramîlter, nijadperest û Hizbûlkontra re dest bi êrîşan kirin. Wesayîtên zirxî û tangên dewleta AKP'ê daketin qadên Kurdistanê. Di roja 6'ê Cotmehê ve li Kurdistanê pêvajoyeke ku salên 90'î dianî bîra mirov destpêkir. Ji bo serhildanên gel têk bibin, waliyên AKP'ê derketina kolanan qedexe kir. Lê li hember qedexeyan gel bi biryar bû. Li aliyekê li Kobanê destana berxwedanê dihat nivîsandin, li aliyê din li perçeyên din ên Kurdistanê, serhildanên piştgiriyê wek agirê Newrozê her ku diçû geş dibû.

**7'ê Cotmehê: Serhildan li tevahiya welêt belav bû**

Li Kobanê bi berxwedanan destan dihatin nivîsandin, li deverên din ê Kurdistanê jî gel daketibûn qadan û bi serhildana xwe berxwedana Kobanê silav dikirin.

Serhildanên ku di 6'ê Cotmehê de destpêkiribûn, di roja xwe ya duyemîn de berfirehtir bûn û li her deverên Kurdistanê belav bû. Her wiha li gelek bajarên Tirkiyeyê û Ewropayê Kurd û dostên Kurdan agirê serhildanê geştir dikirin.

Bi taybetî Bakurê Kurdistanê, li hember faşîzma Erdogan bi awayekî çalak bibû yek beden. Kûçe û kolan veguhirîn qadên serhildanê. Serhildanên gel her ku diçû mezintir dibûn. Li hember serhildanên gel êrîşên çeteyên AKP'ê yên ku rojên pêş destpêkiribûn, di 7'ê cotmehê girantir bûn û vegihûrî qetlîaman. Hêzên paramîlîter ên Erdogan ji bo serhildana gel têk bibe, bi çekan dest bi êrîşan kirin. Agahiya qetlîamên serhildanên Kobanê cara yekem ji navçeya Gimgim a Mûşê hat. Di dema çalakiyê de, ciwanê 25 salî Hakan Buksur, ji aliyê tîmên taybet ên AKP'ê ve hat qetilkirin. Agahiya qetilkirina Buksur agirê serhildanê bêhtir geş kir. Gelê Serhedê bi vê agahiyê asta berxwedana xwe bilintir kir. Di serî de navçeyên wekî Bazîd, Îdir, Gimgim, Erdîş û Elbakê li gelek deverên bajarên Serhedê bi hezaran Kurd bi hêzên AKP'ê re ketin nav şer û peçûnan.

Di wan kêliyan de Amed bibû wek agir û bizot û bi ser serê dagirkeran ve hildiweşiya… Lê bele agahiyên kuştinan ji Amedê jî hatin. Agahiya yekem ji taxa Xençepekê bi kuştina Mahmûd Enes hat. Piştî vê qetilkirinê agahiya duyemîn ji taxa Bağlar a ku çeteyên paramîlîter xwe piranî bi cih kiribûn hat. Welatiyê bi navê Suleyman Kale di encama êrîşên hêzên AKP'ê de hat qetilkirin. Bi van her du kuştinan ve êrîşên polîs û çeteyan bêhtir zêde bû. Li hember van êrîşan welatiyên ku rabûn ser piyan gav paş ve neavêtin. Berxwedana gel bêhtir mezintir bû. Pevçûnên di navbera her du aliyan de girantir bû.

Hikumeta ku li hember berxwedana gel têk çû, neçar ma di 7'ê hezîranê de li gelek navçe û taxên Amedê derketina kolanan qedexe kir.

Serhildanên gel ên di 7'ê Cotmehê de li bajarên wekî Mêrdîn, Mûş, Wan, Sêrt, Stenbol û Îzmîrê dewam kirin. Li bajarên ku serhildan pêk hatin dewleta AKP'ê li hember berxwedana gel neçariyeke mezin jiyan kir. Rejîma Erdogan hewl da ku vê neçariya xwe bi qetlîaman çareser bike.

Li gel qetlîamên li Amed û Mûşê li Mêrdînê Kerem Karaaslan, li Wanê welatiyê bi navê Hamît Caner ji aliyê tîmên taybet ve hatin qetilkirin. Li Sêrtê jî Yusuf Çelîk ê temenê xwe 17 salî û Mehmet Erdogan ê 35 salî ji aliyê cerdevanan ve hatin qetilkirin.

Yek ji bajarên ku hêzên paramîlîter û Hizbûlkontra daketibûn qadan jî bajarê Batmanê bû. Li Batmanê rejîma Erdogan li gel hêzên xwe wekî li Amedê çeteyên Hudaparê jî bikar anî. Endamên Hudaparê yên ku li rex polîsan cih girtin, wekî li Amedê qetlîman pêk anîn.

Qetlîmanên çeteyên dewletê ne tenê li Kurdistanê, li bajarên wekî Îzmîrê jî pêk hatin. Di 7'ê Cotmehê de li navçeya taxa Doganlar a navçeya Bornovaya Îzmîrê welatiyê bi navê Ekrem Kaçaroglu ji aliye polîsan ve hat birîndarkirin. Kaçarogluyê ku birîndar bû li ber çavên polîsan rastî tundiya nijadperestan hat û li cihê ku hat birîndarkirin jiyana xwe ji dest da. Li gel van qetlîaman li navendên berxwedanan bi dehan welatî birîndar bûn. Bi sedan kes hatin binçavkirin û hatin girtin. Di 7'ê Cotmehê de li van bajarên ku serhildan pêk hatin, dewleta AKP'ê bi hemû sazî û dezgehên xwe ve têk çû. Bi dehan avahiyên fermî yên dewletê an hatin şewitandin an jî hatin desteserkirin. Ev yek jî li Kurdistanê têkçûyîna dewleta AKP'ê raxist ber çavan. Li hember êrîş û qetlîmanên rejîma Erdogan, gelê kurd gav paşve neavêtin û serhildanên xwe geştir kirin.

# ENKS'ê sîxura MÎTa Tirk û PDK'ê  ye

Polîtîkayên xiyanetê yên qirêj ku li dijî ciwanên Rojavayê Kurdistanê tên meşandin, li Enqere û Hewlêrê tên amadekirin. ENKS'ê bi fermana Mîta Tirk û PDK'ê  ciwanên kurd yên Rojava direvînin Başûrê Kurdistanê, bi rêya pereyan, fihuşe û madeyên hişbir hewil didin wan bikin sîxur û di çerxa xiyanetê de wan dizîvirînin.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Tifaqên qirêj ên li derdora MÎT-PDK-ENKS'ê bi awayekî şênber derdikevin holê, mîrateya dîrokî ya ENKS'ê ku bi awayekî aktîf lingê xiyanetê li Rojava dimeşîne. Li hember xayîn wê tu carî  agirê dile vî gelê natefe ewe her û her geşbibe.

### MÎT, PDK û ENKS'e li navenda Sêmêlê sîxuran ava dikin

Navenda Sêmêlê a  girêdayê bajarê Dihokê  ku bûye navenda MÎTa Tirk bi 10'an ciwanan perwerde dikin û dişeyinin Rojavayê KurdIstanê da ku agahiyan kom bikin û ji navenda MÎT'ê re bişînin. Endamên MÎT'ê her çend rojan carek derbasê Sêmêlê dibin û her çend rojan carek zanyarên Rojava digrin û dibin Tirkiyê.
Ne tenê Rojavayê Kurdistanê, di heman demê de li Başûrê KurdIstanê jî saziya Parastin ya girêdayî PDK'ê  agahiyan li ser kesan kom dike û piştre şantaj û gefan li wan dixwin û bi vî rengî wan davêjin çiraxa sîxortiyê.

### PDK û dewleta Tirk hewil didin xebatkarên Rêveberiya Xweser birevînin Başûr

Gelek navendên hevpar yên di navbera PDK û dewleta Tirk de hatine avakirin û li van navendan jî şerê Rojava dikin. Ew dixwazin mirovan û bi taybet kesên ku di nava saziyên Rêveberiya Xweser de kardikin, birevînin  derveyî Rojava.
PDK'ê di bin navê ewlekariyê de bi îstîxbarata Tirk re hûr û kûr kar dike, berê vî hevkariyê daye Rojavayê Kurdistanê, tîrên bi jehr davêjin destkeftiyên wê û dixwazin Rojava radestî dewleta Tirk bikin. Gelek kesên zeîf û ketî xwe radestî çend qirûşan dikin. Gelek caran dest dirêjî li jinên kurd hatine kirin û dîmenên wan hatine kişandin, û li hemberî wan bikartînin ku wan bikin sîxur. Jiyana gelê kurd dikin hembêza dagirkeriyê de.

### PDK'e û ENKS'  di rêya xiyanetê de asê mane

Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bi derketina Tevgera Apocî re heya niha bi dewleta Tirk a dagirker re di nava hevkariyê de ye û ev hevkariya PDK'ê di salên dawî de bi taybet li Başûr û tevahî Kurdistanê li dijî Tevgera Azadiyê û gelê Kurd sîxûrtiyê ji dewleta Tirk a dagirker û qirker re dike. Encumena Niştîmanî a Kurdê Sûrî (ENKS) jî li Rojava û Başûrê Kurdistanê ji PDK'ê re ya sîxuriyê (ajantiyê) dike. Ango gotin di cih de be ENKS di rewşeke hetikandinê de ye
Ji ber vê yekê ev kes û komên di nava ENKS'ê de ku tevlî êrîşên qirker yên li ser gelê xwe bûne, îmze avêtine bin her cûre pêkanînên dijmirovahiyê ya di serî de li Efrîn, Serêkaniyê, Girê Sipî û tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên kirin.
Armanca wan çi ye, dîroka wan çi ye? Çima ewqas mijara diyaloga kurdî-kurdî dixin rojevê? Nêzîkatiya wan a li hemberî çand û zimanê Kurdî çi ye? Herî girîng jî niha Kurdên ku li dijî her cûre dagirkeriyê, pişavtin (asîmilasyon) û qirkirinê têkoşînê didin tiştê meraq dikin, ev kesên ku li hemberê gelê xwe ewqas kîn, hêrs, nefretê dike û di ritma xiyanetê de asê mane. Ev kesên ku di ENKS'ê de cih digirin, armanca wan a helwestek wiha çi ye.

### Bermahiyên xiyanetperestan li dijî şoreşa Rojava ketine dewrê

Bi destpêkirina kirîza Sûriyê re, hin Kurdan bi çeteyên ku navê opozisyonê li xwe dikin bûn yek û li gel hêzên ji aliyê dewleta Tirk a mêtinger ve hatin birêxistinkirin ku navenda xwe li Stenbolê bû, dest bi kar kirin. Her ku şoreşa Rojava bi pêş de çû, van kesayetan tevî komên çete yên faşîst, înkarker û selefî bûn, dest bi êrişa li dijî şoreşa Rojava kirin.  Van kesan hemû êrişên li dijî Kurdan ên li Helebê û derdora wê bi rê ve birin. Di êrişên El-Nusra û DAIŞ'ê de ev kes û çeteyên girêdayî wan jî hebûn. Yek ji berpirsyarên 12 hezar şehîd û zêdetirî 20 hezar birîndarên şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî ew in. Li hemberî pêşketina kantonên Rojava û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê PDK'ê ew di bin navê PDK/S û piştre jî ENKS'ê de anîn cem hev da ku nasnameyeke siyasî bidin wan. Armanc tesfiyekirina şoreşa Rojava bû û li şûna rejîma Baasê avakirina xîlafeteke selefî ya dewleta Tirk a faşîst  bû.
Li ser vê bingehê PDK û MÎT'ê komeke çete yên leşkerî ji Kurdên ku ji Rojava ber bi Bakur û Başûr ve reviyan, ava kirin. Ev avaniya çete ya bi navê Roj jî hêza paramîlîter (leşkerî) ya ENKS'ê ye. ENKS bi giştî ji 18 partî û hin kesayetan pêk dihat. Di demeke kurt de hema bêje ev hemû pêkhate ji ENKS'ê qetiyan. Tenê PDK-S û yek du partiyên şexsî man. Çeteyên Roj jî wisa ne. Karê destpêkê yê çeteyên Roj êriş û qirkirina gerîla û gelê sivîl ê li Şengalê bû û ev hêza ku MÎT'ê organîze kiriye û li Baregeha xwe ya Başîka ya Musilê perwerde kiriye, niha ji bo qadên gerîla yên li Başûr dorpêç bike û êrişî gerîla bike, ketiye pozîsyonê. Avaniyên çete ku li Efrîn, Girê Spî, Serêkaniyê û herêmên din ên dagirkirî li dijî Kurdan û gelan qirkirinê dikin, tevî van çeteyên Roj jî êrişî gerîla dikin
Li gel artêşa Tirk a faşîst-dagirker, hêzên ser bi hikumeta Hewlerê ve êrişî gerîla kirin. Artêşa Tirk a faşîst û hêzên PDK'ê bi hev re ev êriş pêk anîn. Niha jî PDK bi desteka hêzên cuda yên navneteweyî mîna sala 1992'yan ji bo tesfiyekirinê û heke ev nebe jî, ji bo ku ji Başûr derxe, êrişên xwe bi dewleta Tirk a faşîst re didomîne.




### ENKS'ê dîroka sîxurtî û xiyaneta PDK'ê ji xwe re mînak digire

Ev çete ku dibêjin ew li ser navê Kurdên Rojava tev digerin, lê ji bo Kurdên Rojava tiştekî nakin û heta di nava hemû hewldanên qirkirinê yên li dijî Kurdan de jî cihê xwe digirin, dîroka xiyanet û sîxûrtiya PDK'ê ji xwe re mînak digirin. Lewra Alaattîn Kapan ku di pêvajoya 12'ê Adarê 1980'an de li Tirkiyê sîxurekî di nava çepgiran de bû, di heman demê de PDK'yî bû. Kapan bi navê 'Beş Parçacilar' (Stêrka Sor) rêxistinek ava kir û şoreşgerên bi navên Mehmet û Îlhan li Nurî Pazarbaşi ya Dîlokê qetil kirin. Alaattîn Kapan ji komkujiya Taksîmê ya Stenbolê ya 1'ê Gulana 1977'an berpirsyar bû.  Û vî ajanî, pêşengekî Tevgera Azadiyê ya Kurd Hakî Karer jî qetil kir. Piştî kuştina Hakî Karer ku Rêber Apo jê re digot 'ruhê min ê veşartî', Alaattîn Kapan ji aliyê şoreşgerên Kurdistanê ve hate cezakirin û rêxistina 'Beş Parçacilar' ji hev belav bû
Di sala 1978'an de piştî kuştina 4 mamosteyên şoreşger ji aliyê faşîstan ve li Çewlikê, PDK'a Tirkiyê jî ji hev belav bû. Hin ji alîgirên partiyê, di çarçoveya projeya PDK û MÎT'ê de çeteyeke bi navê KUK ava kir. Yekane peywira wê êrişên li ser PKK'ê bû. Ev rêxistina ku xwe wek 'Azadîxwazên Neteweyî yên Kurdistanê' bi nav dikir, ji bo rizgariya neteweyî guleyek jî li dijî mêtingeriyê-dagirkeran neteqandiye. Lê bi dehan şoreşger û sempatîzanên Kurdistanê qetil kirin. Dema ku li dadgehên Amedê dihatin darizandin, endamên KUK'ê li xwe mikur hatin ku ew li dijî PKK'ê hatine damezirandin û tenê li dijî PKK'ê çek bi kar anîne. Pratîka wan tenê dijberiya PKK'ê û li gorî talîmata MÎT'ê belavkirina propagandayê bû. Bi taybetî piştî salên 1960'î PDK'ê dest pê kir ku rêxistinên şoreşger-demokratîk ên li Başûr û gelemperiya Kurdistanê ji hev bixe. PKK'ê piştî sala 1980'yan di çarçoveya biryara vegera li welêt de li Başûrê Kurdistanê bingehek girt û PDK'ê jî ji bo kontrolkirin an jî tesfiyekirina gerîla bi dewleta Tirk a faşîst re dest bi kar kir. Ev hevkarî di salên 1990'î de li dijî gerîla bû êrîşkariyeke çekdarî. Di şerê Başûr ê sala 1992'yan de PDK'ê UDG ku li Bakur ava bûbû, di bin banê hikumeta Hewlerê de bi rêxistin kir.
Li gel artêşa Tirk a faşîst-dagirker, hêzên ser bi hikumeta Hewlerê ve êrişî gerîla kirin. Artêşa Tirk a faşîst û hêzên PDK'ê bi hev re ev êriş pêk anîn. Niha jî PDK bi desteka hêzên cuda yên navneteweyî mîna sala 1992'yan ji bo tesfiyekirinê û heke ev nebe jî, ji bo ku ji Başûr derxe, êrişên xwe bi dewleta Tirk a faşîst re didomîne.



## Piştperdeya şer û pevçûnên rojhilata navîn

**Dilyar Cizîrî**

Di roja 7'ê Cotmeha sala 2023'yan de tevgera Hemas a Filistînî li dijî Israîlê êrişa bi navê "Tofan El-Eqsa" pêk anî. Di encamê de bi hejmarek mezin welatiyên Israîlî yên sivîl hatin kuştin, gelek bi saxî hatin revandin. Di wê rojê de alîgirên Hemas wiha texmîn kirin ku wan Israîl tune kiriye û serkeftina mezin bi dest xistin.
Çend roj di navbera me û salvegera yekem a êrişa navborî de mane. Di nava vê demê de rêveberiya Israîl ya herî sûdgirtî "Tofan El-Eqsa" derket. Israîl herêma Xeza ku ji aliyê Hemasê ve dihat rêvebirin kir, navenda şerê xwe yê topyekun. Serokê Hemasê Ismaîl Heniya jî di nav de hejmarek zêde ji Rêveberên Hemasê û navendên wê yên leşkerî hatin tesfiyekirin. Xeza li ser welatiyên Filistînê hate ruxandin û bi hezaran welatî bûn qurbanî.
Balkêşe Îsarîl li vir ranewestiya û êrişên xwe li dijî Lubanê û Huzib El-Ah bi dijwarî da destpêkirin.
Bingeha Êrişa tunekirinê bi teqîna komî ya hemwext a alavên vegihînê (bêtêl) ên ji aliyê endamên Huzib El-Ah ve dihatin bikaranîn. Hîn Rêveberiya Huzib El-Ah ji derbeya yekem hişiyar ne bibû, pêla duyemîn a teqîna telefonan pêk hat, ew jî derba duyemîn a giran li dijî Hizib El-Ah ê bû. Îsraîl li vir jî ranewestiya û derbeya herî giran ku xwe dispêra hêza istxbaratî tesfiyekirina Sekreterê Giştî yê Huzib El-Ah ê Hesen Nesrela û komek rêveber û fermandarên wê bû.
 Êrişên Israîl li dijî Huzib El-Ah û Hemasê hîn jî bê navber dewam dike. Wezîrê Parastinê yê Israîl di daxuyaniyên xwe de, gef li Hizib El-Ah ê xwarin û got hîn gelek tiştên bêne kirin, mane. Ji vir jî diyar dibe ku Hêza navdewletî û hegemoniya cîhanî rê ji Israîlê re vekiriye, li dijî Huzib El-Ah, Hemas, Îran û komên wê yên li Sûriyê û Iraqê tevgereke tesifiyê pêk bîne. Ev di çarçoveya xetimîna hêzên serdest bi hemû nav û rengên xwe de pêk tê. Yên di wê navberê de dibe qurbanî jî gel e, dibe hejmarek alîgirên Huzib Al-Ah, Hemas, Îran û her wekî din hatibin kuştin. Lê bi hezaran welatiyên sivîl li ber çavên cîhanê têne kuştin, birîndarkirin û koçberkirin. Angu careke din civaka Filistîn û Lubnanê dibin ardiwê plan û lîstokên wan.
Di rewşeke wiha de hin dengên bi kurdî derdikevin dibêjin wekî Hemas, Hizb El-Ah û her wekî din metirsî li ser Rêveberiya Xweser û hêzên wê yên leşkerî jî heye!.
Di nêrîna min de berûvajî dema xetimîn zêde dibe, wê her kes hewl bide li riyên çareseriyê bigerin. Rêveberiya Xweser ku di aliyê xwe yê bîrdozî û rêxistinî de qet ne wekî Hemas û Huzib El-Ah ê ye. Dewleta Tirk bi rewşa xwe ya heyî jî nabe wekî Israîlê.
Nêrîna min berûvajî niha ji bilî sîstema Rêveberiya Xweser û Konfedraliya Demokratîk ji bo Rojhilata Navîn tu riyên din nîn e. Ev di rojên were de hîn zêdetir wê bikeve meriyetê. Rêber APO di parêznameyan de rewşa li Rojhilata Navîn baş lêkolîn kiriye û riya çareseriyê xêz kiriye, Ew jî bûye mertala sereke ya parastina Rêveberiya Xweser.



# 'Dîlgirtina Rêber Apo dîlgirtina mirovahiyê ye'

Jina bi navê Terfa Hecî Elî ku ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha xwe ji  jiyana derveyî malê qut kiriye û eger ne ji bo rewşeke lezgîn be ji mal dernakeve diyar kir ku dîlgirtina Rêber Apo dîlgirtina aşitî û demokrasiyê ye.

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Terfa Hecî Elî bi navê xwe yê din Jiyan Ocalan li Bajarê Hesekê jiyan dike. Dema temenê wê 23 sal bû, Rêber Apo rastî Komploya Navnetewî hat û radestî dagirkeriya Tirk hat kirin. Terfa jî pîştî wê rojê ji jiyana rojane û derketina derveyî malê xwe qutkiriye.
Derheqê jiyana xwe û bandora ku Rêber Apo li kesayeta wê kiriye, Terfa Hecî Elî ji rojnameya me ra axivî.

### 'Dîlgirtina Rêber Apo bû qutbûna min ya jiyanê'

Jiyan Ocalan da xuyakirin ku piştî Komploya Navnetewî 15'ê Sibatê ya li ser Rêber Abdullah Ocalan hatiye meşandin, wê xwe ji jiyana ji derve qut kirye û wisa dest bi axaftina xwe kir:  "Navê min Terfa Hecî Elî ye, li bajarê Hesekê jîyan dikim. Komploya navnetewî ya 15'ê Sibatê wek her kesayetekê li ser kesayeta min jî bandorek mezin da avakirin. Ji ber ku Rêber Apo ne tenê Rêberê gelê Kurd e, heman demê de vîn û zanista civakê ye. Ji ber wê jî gelê Kurd û Rojhilata Navîn bi ramanên Rêber Apo jîyan dike. Ji ber wê yekê dema Rêber Apo rastî kompoloyek navnetewî hat wek dibêjin nefesa me ya gelê Kurd qut bû. Piştî dîlgirtina Rêber Apo min jî di wê demê de jiyana ji derveyî malê li xwe heram kir. 26 salin min xwe ji jiyana derveyî malê qut kirye. Şahî û ahengên ku çê dibin bi ti awahî ez tevlî nabim. Xwarin û vexwarinên keyfî naxum. Jiyan Ocalan di odeyekê ku bi wêneyên Rêber Apo hatiye xemiland de jiyana xwe didomîne. Jiyan dibêje ger ku Rêber Apo dikare di nava sistemê qirkirin û îşkenceyê de têkoşînê bike, em jî weke şopdarên doza Rêber Apo dikarin vê dozê belav û mezin bikin. Jiyan got ku Heya rewşekê lezgîn neqewime, ez dernakevim ji derve û bi vî awayî girêdana xwe ya bi Rêber Apo re, dide xuyakirin."

### 'Ruxmê hişyariyên malbat û civakê heya Rêber Apo azad nebe, ez dest ji helwesta xwe bernadim'

Terfa axaftina xwe wisa domand: "Rêber Apo dema ez zarokbûm, min dîmenê ku Akademiya Mahsum Korkmaz ya newala Bekayê guhdar dikir. Dahûrandinên Rêbertî yên li ser şervanên azadiyê min kesayeta xwe têde dît û ez pir bandor bûm. Rêber Apo dibêje 'Yê min wek rêber dide jîyan kirin ez zêdetir rêberê wî/ê me'



Nêrîn û nirxandinên Rêber Apo pêşxistina kesayetê bingeh digre. Ji bona helwesta min, civat û cîranên derdorên me navê min kirin Jiyan Ocalan. Wêneyên Rêber Apo diparêzim û wana bi rêk û pêk paqij dikim. Ramanên Rêber Apo şêwaza min ya jiyanê ye. Her çiqas asta min ya xwendinê kêm be jî, bi hebûna paraznameyên Rêber Apo hêz dide jiyana min. Ez carnan jî, rastî hişyarîyên malbatê têm. Raste malbat welatparêze lê welatparêzîya wan di asta sembolîtîk deye. Lê girêdana min ya Rêbertî, bi ya malbata min cudatir e. Rêber Apo kîjan demê azad bibe, wê demê wek kesayet ez jî dest ji helwesta xwe berdim û bi dilgermî tevlî jiyanê bibim."

### 'Pewîste ji bona azadiya Rêber Apo ya fîzîkî têkoşîn bê xurtkirin'

Terfa axiftina xwe wisa qedand: "Azadiya Rêber Apo wek nan û av ji bona me giringe û pêwîste ku Rêber Apo demildest fîzîkî bê azad kirin. Ji bona azadiya Rêber Apo divê tevahî civak ji 7 salî heya 70 salî têkoşînê bikin û li dora Rêber Apo kom bibin. Ez bi gihiştina destpêkirina komploya navnetewî ya 9'ê Cotmeha 1998'an li ser Rêber Apo destpêkirî, soza bilindkirina têkoşînê didim û silavên xwe ji bona hemû dîlgirtîyên azadiyê û Rêber Apo re dişînim"

## Dîsa Lavrov û dîsa gef û sucdarkirina Kurdan

**Zekî Bedran**



Wezîrê Derve yê Rûsyayê S. Lavrov dîsa derbarê Sûriyê û kurdan de daxuyanî da. Nakokî û hevrikiyên Rûsyayê yên bi DYA re tên zanîn. Eşkere ye ku hewl dide Kurdan jî bike parçeyekî vê nakokiyê û ev yek nayê qebûlkirin. Kurd ne xwediyê wê luksê ne ku bibin alîgirê nakokîyek wiha. Beriya her tiştî Kurd gelekî ku di bin qirkirinê de ye. Lavrov bi berdewamî  lansekirina wan wek alîgirê Amerîka'yê  nîşaneya niyeta xirab îfade dike.
Beriya her tiştî em diyar bikin ku DYA ji bo Kurdan hêz nexistiye Sûryeyê. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ji bo li dijî DAIŞ'ê şer bike, hêzên xwe anîn Sûriyeyê. Sedema ku rê ya wan bi Kurdan re gihîşte hev, şerê li dijî DAIŞ'ê ye. Berê DAIŞ'ê ji aliyê Tirkiyeyê ve ber bi Kobanê ve hat dayîn. Kurd di bin êrîşên dijwar de bûn. Ger Rûsya li şûna DYA'yê gav biavêta û alîkariya Kobanê bikira, bi awayekî xwezayî wê Kurdan bi wan re hevkarî bikira. Lê Rûsya ji bo alîkariyê nehat. DYA jî dît ku ji bilî Kurdan tu kes bi giranî li dijî DAIŞ'ê nikare şer bike. Artêşa Sûryeyê û Iraqê ji destê DAIŞ'ê direvin. Ji bo herêm nekeve destê DAIŞ'ê, DYA'yê tercîh kir ku bi Kurdan re hevpar tevbigere.
Dewleta Tirk bi PYD'ê re hevdîtin pêk anî. Tişta ku ji PYD'ê dixwest ew bû ku li dijî Beşar Esed şer bike û bi hêzên bi navê opozîsyona Sûryeyê re itîfaqê bike. Kurdan ev yek qebûl nekir. Dema ku Kurdan qebûl nekir ku li dijî Esad şer bikin, Tirkiyeyê Kurd xistin kategoriya dijmin. Di rojên ku DAIŞ'ê herêmên sînor girtibû, rêveberiya Erdogan tu bertek û nerehetî nîşan neda. Wî ne got ku terorîst gihîştine sînorên min û ewlehiya welatê min di metirsiyê de ye. Nûnerê Amerîkayê, yê wê demê yê taybet bo Sûriyê Brett McGurk jî vê yekê baş dizanîbû. Yek ji kesên ku herî baş xerabiyên ku Tirkiyeyê bi DAIŞ'ê re kirine dizane Lavrov bi xwe ye. Di destê wan de hemû agahî û belge hene. Hin ji wan jî wê demê dane çapemeniyê.
Lavrov got, "Kurdan piştî êrîşên Tirkiyeyê xwe nêzî Sûryeyê kirin. Ew hatin cem me, lê dema Emerîka got ku ew ji Sûryeyê venakişe, careke din xwe nêzî Amrîkayê kirin." Ne hewce ye ku êdî her tiştên di wan rojan de qewimîn dubare bikin. Lavrov raya giştî şaş agahdar dike. Dema ku artêşa Tirk û çeteyên di bin fermana wê de herêmên wekî Serêkaniyê dagir kirin, Amarîka ji berê ve vekişiya û herêm ji dagirkeriyê re vekir. Pişt re Amerîka'yê mudaxele kir û agirbestek hate kirin. Li herêmên ku Amerîkî vala hiştin, Leşkerên Rus xwe bicîh kirin. Leşkerên Sûryeyê ber bi sînorên Tirkiyeyê ve hatin veguhastin. Ev yek jî di çarçoveya peymana ku bi Rêveberiya Xweser re hate çêkirin pêk hat. Weke ku tê dîtin, demagojiya mîna DYA wê ji bo Kurdan dewletekê ava bike, dûrî rastiyê ye. Lavrov gelek caran serî li vê gotinê dide.
Kurdan tu carî negot em ê dewletek cuda ava bikin. Di vê mijarê de talebên xwe bi awayekî nivîskî pêşkêşî Rûsyayê jî kirin. Talebên wan yên bingehîn naskirina hebûna wan ya çandî û qebûlkirina nasnameya wan e. Her wiha di plana çareseriya Sûriyeyê ya Rûsyayê de jî madeyeke ku tê de ji Kurdan re dayîna xweseriya çandî hebû. Lavrov niha weke ku ev yek ji bîr kiriye diaxive. Lê ji bîr nekiriye, vê yekê bi zanebûn dibêje û dixwaze peymanên veşartî yên ku bi Tirkiyeyê re kirine veşêre. Ji bo civîna mezin a li Soçiyê were lidarxistin, ji rêveberiya xweser daxwaza 120 delegeyan kiribûn. Her tiştê delegeyan amade bûn, lê Rûsyayê di kêliya dawî de bi aliyê Tirk re li hev kir û çûyîna delegeyan a Soçiyê betal kir.
Rûsyayê nehişt ku nûnerên rêveberiyên xweser bikevin Komîteya Destûra Bingehîn a Cenevreyê jî. Digotin Tirk asteng dikin. DYA jî heman tişt got. Her wiha pêvajoya Astanayê ji bo Kurdan rewşeke îbret bû. Di daxuyaniyên dawî yên wan hevdîtinan de her tim Kurd weke hêzeke ku dixwazin Sûryeyê parçe bikin hatin nîşandan. Di dema ku Tirkiyê beşeke girîng ji Sûriyê dagir kiriye, nêzîkî sed hezar çete çekdar kiriye û ji wan Artêşa Azad wek alternatîf ava kiriye, ew ne parçebûn û ne derveyî hiqûqî ye, lê Kurdên ku welatiyên Sûryeyê ne û demokrasiyê dixwazin, her tim wek tehdîd û hêzeke dabeşker nîşan dan. Di encamnameya dawî ya civîna dawî ya Astanayê de Rêveberiya Xweser bi awayekî eşkere ne rewa hat ragihandin. Pêvajoya Astanayê eniyeke li dijî Kurdan, li dijî Rêveberiya Xweser e, ev rastiyeke bê nîqaş e.
Dema ku rayedarên Rûsyayê hêzên xwe li herêmên xweser bi cih kirin, soz dan Kurdan û Rêveberiya Xweser. Gotin em ê bibin navbeynkar, em ê we bi rêveberiya Şamê re li hev bikin. Kurd her tim ji bo aştî û yekitiya Sûryeyê xebat kirine. Eger Şamê bi Kurdan û herêmên xweser re lihevkirinek bikira, niha Tirkiye nikarîbû li Sûryeyê bimîne. Wê Sûriye komî ser hev bibûya. Her wiha Kurdan tu carî dev ji diyaloga bi Şamê re berneda. Lavrov dibêje divê Kurd bi Şamê re li hev bikin. Pir baş e, wê demê bila giraniya navbeynkariya xwe deyne holê. Her wiha her kesî dizanîbû ku Rûsya alîgir e û hikûmeta Sûryeyê diparêze û hewl dide wê li ser linga bihêle. Lê kurdan ev yek nekir pirsgirêk. Hem dixwestin pirsgirêkên xwe bi Şamê re çareser bikin û hem jî bi Rûsyayê re tu pirsgirêk nînbûn. Kurdan ti carî dijberiya Rusya nekiriye.
Bi salan e bi Şamê re hevdîtin hene, lê ti pêşketin pêk nehatin. Ji ber ku Rusya giraniya xwe ne danî. Sedema vê jî angajmana ku bi Tirkiyê re ketibûyê de ye. Tirkyeyê ti carî nexwest ku Kurd bibin xwedan statû. Ger Şam erê bike jî, wê Ankara bibêje "na." Rusya ji ber vê yekê ji gel re rastiyan bi awayekî rast nabêje. Di wateya rastî de rolê xwe yên navbeynkar ne leyîstiye, lê dixwazê fatûra wê ji Kurda bibire.



## Kuştina Hasan Nasrallah

**Farûk Sakik**

Şerê Cîhanê yê Sêyem ev 30 sal in dewam dike. Di van salên dawî de bi siwîqastan şerê Rojhilata-Navîn derbasî qonaxeke nû dibe. Bi kuştina Qasim Sulêyman dest pê kirin. Piştre me dît rojek helîkoptera Îbrahîm Reîsî dema ji Azerbeycanê vedigeriya ket. Reisî jiyana xwe ji dest da. (Piştî çalakiya teqandina bêtêlên Hîzbullahiyan, derket hole di helîkoptera Reîsî de bêtelek teqiyayî hatiye dîtin). Piştî demek, lîderê Hemasê, Îsmaîl Haniye li Îranê hat kuştin. Herî dawî jî lîderê Hîzbûllah Hasan Nasrallah hat kuştin. Pîştî kuştina Hasan Nasrallah di medya civakî de videoyek hat parvekirin. Oldarek Şiî, 2 roj beriya bûyerê, hişyarî dida Hasan Nasrallah û digot Îranê te firot wê te bikûjin. Îran piştî hemû kuştinan behsa tolhildanê dikir û tu tiştek jî nedikir. Dema ku mirov li bêdengiya Îranê ya piştî kuştina 'Îsmaîl Haniye' dinêrê, axaftina oldarê Şiî di cîh de dibîne. Îran piştî ku şer li Rojhilata Navîn germ bû, vekişiya nav xaka xwe û sînorê xwe parast. Her wek teslimî Îsraîl bibe, bêdeng ma. Ne bi tenê Îran hemû netewe dewlet di rewşên wiha de berjewendiyên xwe diparêzin. Di Şerê Cîhanê yê Sêyem de bi eniya Lubnanê şer ber bi ku ve diçe? Natenyahû dema ku li Neteweyên Yekbûyî axivî di dest wî de 2 nexşe hebûn. Hedef û armanca vî şerî di wan nexşeyan de bû. Yek xetên enerjiyê û ya dudiyan jî ji Lubnan heta Îranê tunekirina dewletan (Luban, Sûriye, Iraq û Îran) hebû. Îsraîl di vî şerî de Îranê wek tehdîtek ji xwe re nabîne. Ew bi dû wan hêzên ku Îranê kiş-kişî Îsraîl kiriye ketiye. Ev hêz  Hemas, Hîzbullah, Haşdî Şabî û hin rêxistinên bi wan re tevdigerin. Îsraîl ji bo ku bigihîje hedefa xwe êrişî van rêxistinan dike. Hin kes behsa şerê bejayî ango dibêjin wê Îsraîl li Lubnanê tevgerek bejayî bide destpêkirin. Di roja me de pêdivî bi şerek bejayî tune ye. Îsraîl dizane ku di şerê bejayî de wê ziyanê bide. Yek neferek wan were kuştin jî ji bo wan nebaşe. Tişta ku dixwaze bidestbixe ji xwe bi hêza xwe ya hewayî pêktîne. Hîzbûllah û Hamas jî dixwazin li erdê şer bikin. Ev taktîkên Îsraîl yên şerê nexşeya yekemîn bûn.
Di nexşeya duyem de jî xeta enerjiyê hebû. Wisa dixwiye ku li gor vê nexşeyê, heta serê boruya enerjiyê ku ji Hîndistan birêketî, negihîje Ewrûpa wê şer dewam bike.  Ev şer li Rojhilata Navîn û li ser xaka Kurdistan tê meşandin. Dijminê Kurdan jî dixwazin ji vî şerî sûd wergirin. Dema aloziyek çêdibe dixwazin Kurdistanê bikin bin bandore xwe da ku Kurd ji vê aloziyê sûd wernegirin. Herdû alî, ya li ser hîmên olperestî-mezheperestî an jî nîjadperetî vî şerî birêvedibin. Di şerde bedela mezin jî gelên herêmê didin.
Pozisyona Kurdan di vî şerî de xeta sêyemîne. Kurd alîgirê tu aliyek nîne. Herdû alî jî sûcdarin. Herdû alî, gelên herêmê dikin qûrbana berjewendiyên dewleta xwe. Çareseriya şer jî ji bo aliyan, paradigmaya Rêber Apo ya ku pêşxistî; netewa demokratîk e. Di sîstema netewa demokratîk de jiyana însanan-gel esas tê girtin. Carek dinan jî hat îspatkirin komplo û tecrîd ji bo ku ev xeta sêyem li Rojhilata-Navîn pêşnekeve, Rêber Apo midaxleyî vî şerî nekê, dane destpêkirin. Îsraîl û Filistîn divê hevdû qebûl bikin da ku ev kareseta mezin bi dawî bibe.
Kurd jî di vî şerî de, divê bi amadekarî bin û ji bo berjewendiyên welatê xwe siyasetek maqûl bimeşînin.